GABAR ÇİYAN

# Pirsa Sînema Kurd û Yilmaz Guney

-1-

Institut kurde de Paris

** Dîtinê sînemekarên Kurd li ser Sînema Kurd û Yilmaz Guney*

** Jiyana Yilmaz û dîtinên wî li ser huner û hunermendiyê*

** Nirxandinek bi tevayî li ser filmên Yilmaz Guney*

4.113 ÇIY PIR

Weşanxaneya Çand

Institut kurde de Paris

LIV. KL. 692
09/12/2010
4110 CIY PIR

(2)

Gabar Çiyan

# Pirsa Sînema Kurd
# û
# Yilmaz Guney

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Weşanxaneya Çand

*Ji bo bîranîna Şehîdê nemir*
*Apê Musa Anter*

Institut kurde de Paris

**Navnîşana xwestinê:**

Box 3119
145 03 Norsborg
Sweden

# Pêşgotin

Karê ragihandinî teorî û pratîkê dixwaze, kesên ku ji herdu awiran ne têr û tije bin, nikarin zêde li ser van pirsan bisekinin. Bi taybetî karê sînemayî pisporiyek mezin, tecrubeyek dûv-dirêj û pêdaketineke taybetî dixwaze.

Ji bo ku karê sînemayî baştir bê tê gihiştin, mirov dikare çend mîsalên berçav bide xuyakirin: gava kesek pirtûkekê bixwîne û bixwaze li ser naveroka pirtûkê yan jî romanekê bibe xwedî dîtineke têr û tije, pêwîst e wî zimanî baş zanibe. Lê sîneme ne wesan e. Mirovên herî nexwende be jî, ji ber ku film li ber çavên wî dileyize, dikare dîtinekê pir alî jê wergire.

Gava mirov li Kurdistanê û hejmara kesên xwende binêre, dikare bi sanahî li ser rola sînemê bighêje dîtîneke berçav...

Sûdên sînemê her ne ev tenê ne. Xwendina pirtûkê dikare demek dirêj, yan jî çend rojan bigre. Lê sîneme ne wesan e. Filmê normal 90 deqîqe ye...

Di her kêliyan de mirov nikare pirtûkan bixwîne. Lê film ne wesan e. Bêhtir dikare mirov bi dûv xwe de bibe. Gava filmek li gor kultûra wî gelî hatibe çêkirin, diyar e ku dê ew karibe gelek kesan di dûv xwe de bikşîne...

Erzanbûna çûna sînemê jî, aliyek din e ku mirovan ber bi xwe ve dikşîne.

Helbet bi vê em naxwazin bînin wê wateyê ku, karê sînemayî ji pirtûkan bi nirxtir e. Lê mirov dikare bêje ku, li Kurdistanê filmek baş dikare di demeke kin de rolekê mezin bileyize; alîkariya karê rêxistînî bike, hesên neteweyî berz bike û ji bo rizgariya xaka niştimanê rolekî mezin bileyize.

Li ser hebûn û nebûna Sînema Kurdî dîtin pir alî ne. Li gor hinekan Sînema Kurdî tune ye. Hinek jî dibêjin heye.

Gava merov kar û xabata Yilmaz Guney û kesên mîna Mêhdî Umêd, Selman Fayiq, Tîmûr Pataî û filmên ku nuha li welat çêdibin bide ber çavên xwe, dikare li ser vê pirsê bighêje dîtinekê: Ku Kurd jî weke gelek gelên din, di karê sînemayî de ne bê par in.

Hevalê me Çiyan, ne sînemekar e. Ji ber ku car carna li ser karê çandî û hwd. ji Rojnameya Yeni Ulke re nivîsan dişîne, yan jî li ser babetên wesan li gor mecalan dinîvisîne, pirsa sînemayî jî, weke hemû pirsên din, têne pêşiya wî.

Wî, ji bo ronîkirina vê pirsê, bi sînemekar û şanogerên Kurd re rûnişt û hevpeyvînên hêja kir. Di dema rûniştinê de, li ser filmên Yilmaz Guney jî, ji çend awiran sekînin. Bi

Institut kurde de Paris

çend hevalan re 80 filmên Yilmaz di çav re derbas kir, li ser her filmekî wî, nirxandinên cewaz hate kirin.

Ew xebata ku hatine kirin, nuha mîna pirtûkekê di destê we de ye. Ez bawer im ku piştî xwendina vê pirtûkê, li ser pirsa Sînema Kurdî û filmên Yilmaz Guney, dê hûnê bighêjin dîtinekê.

Niha li welat, hinek filmên sînemayî hatine kişandin û ew li hin deveran tên nîşandan. Ji ber sedemên berçav heval Çiyan ne dikarî bi wan kesan re rûne û vê pirtukê hîna jî dewlemendtir bike. Lê di pêşerojê de em bawer in ku dê ev kêmasî jî bête çareserkirin.

Ji ber ku gelê Kurd sal bi sal bi hêztir dibe, yekîtiya xwe xurttir dike, cenga rizgariyê bilindtir dibe û dijmin gav bi gav ji xaka me tête derxistin, pêwîst e em jî weke netewên din, ji niha ve li ser hemû dezgehên xwe bisekinin, ji bo avakirin û cîhkirina wan. Karê sînemayî jî yek ji wan karan e ku, pêwîst e bê derengî bête pêşxistin.

Pirtûka di dest we de bi tevahî ji sê (3) beşan pêk têt:

Beşa yekem, hevpeyvînin ku bi çend sînemekarên Kurd re li ser pirsa Sînema Kurdî û Yilmaz Guney hatine çêkirin,

Beşa duwem, li ser kurtejiyana Yilmaz Guney e û her wesan nirxandinek kurt li ser dîtinên wî ye,

Beşa Sêyem jî, nirxandinek gelemperî li ser filmên Yilmaz Guney e.

Xwedîderketina sînemekaran û bi taybetî Yilmaz li ser me ferz e. Rewşenbîrên tirkan û hinek ji reformîstên Kurdan, nuha dixwazin Yilmazê radîkal bikujin û di şuna wî de hunermendekî bê şexsiyet û Yilmazek vala bihêlin.

Pirtûka hevalê Çiyan, ji bo destpêka muneqeşê li ser Sînema Kurdî û Yilmazê radîkal nimuneyek baş e.

Daxwaziya me ewe ku xwendevan ji vê berhemê sudan wergirin û her wiha em berdewambûna kar û xebata heval Gabar dixwazin.

Adar, 1993-Stockholm

**Zêd Yıldırım**
Zanistê polîtîk

Institut kurde de Paris

Li ser pirsa Sînema Kurd û Yilmaz Guney

Bihin sînemekarên Kurd re

# HEVPEYVîN

## Hevpeyvîna bi Tîmûr Pataî re

*Pataî li Rojhilatê Kurdistan li bajarê Sinê ji dayika xwe bûye. 46 salî ye. Di sala 1972-73'an de, zanîngeha Tahran, beşa sînemayî tewaw kiriye û her wê salê dest bi beşa dram kiriye û piştî demeke kurt, bi şêwekî serketî ew beş jî xilas kiriye.*

*Di naybera salên 1969-74'an de di çêkirina gelek filman de li Îran'ê, mîna derhêner (rejîsor) û filmhelgêr (kameraman) kar kiriye. Ji filmên ku çêkirine, çar (4) ji wan dokûment in û li ser jiyana gelê Kurd in. Filmên wî bi tevayî bi zimanê Farisî û Kurdî hatine çêkirin. Navê filmên wî ev in: Emtehan (1972), Dashti Hacudi (1972), Garanavah (1973), Brîn ( 1979), Av (1979), Rûnakî shamakan (1982), Çiya serberzekanî Kurdistan (1983), Hawar ( 1983), Nan û Azadî (1984) û di filmê Gele gurg (1990) de jî mîna filmhelgêr kar kiriye.*

- Mirov dikare wan hewildanên sînemekarên Kurd weke binaxek, ji bo ber bi avakirina Sînema Kurdî ve bijmêrê?

- Li gorî dîtina min, sîneme weke Sînemeya Kurdî- heger mabesta me Sînema Kurdî be û em li ser Sînema Kurdî qise dikin, ew sîneme dikare li hemû cihî hebe û hinekî jî li ser kar hatiye kirin-helbet heya ku mecal hebû, belam eger ewa bê ku problêmên Kurd bi giştî ku jiyana kulturî jî têde hebe, heya ku Kurdistaneke Serbixwe çênebe, Dewleta Kurdî ava nebe, çêkirina filmekî wiha pir dijwar e. Heya nuha hinek hewildan bûne belam wiha niye ku mirov bêjê: ew kar dibê paye ji bo Sînema Kurdî.

Sînema Kurdî wextê ku dibe, pêwîst e li Kurdistanê be. Kurdistan hebe. Weke mîsal, em hinek film dîbînin ku têde bi Kurdî qise dikin- nimûne, di filmê Gele Gurg de me hewl daye ku hinekî ji Çanda Kurdî nîşan bidin, lê ev xebat bi rastî, mirov nikare weke binaxe ji Sînema Kurdî re bihesibîne. Gelek tişt hene mirov nikare li derveyî

Institut kurde de Paris

Kurdistanê bikê, gava tête kirin jî bi sînor e. Weke mîsal, tu dixwazî herî Rusya'yê yan jî Fransa'yê filmekî Kurdî çêbikî. Bingeha wan studyoyên li wir, ji bo filmê Kurdî saz nebûye. Di dema kişandina film de gelek problem têne pêşiya mirovî. Ji dekor heta personel û kostumên pêwîst, divêt weke Kurd û Kurdistanê bêne fikirkirin û amadekirin. Ji bo vê jî, mecalên ekonomîk pêwîst e. Bi rastî gava mirov li van tiştan dinêre, dikare bêje ku çêkirina filmekî Kurdî ne hêsan e. Weke ku min ji serî ve jî diyar kir; heya ku Kurdistan weke welat ava nebe, pirsa Sînema Kurdî jî çareser nabe.

Gava mirov bipirse; çima Sînema Kurdî ava nebûye? Mirov dikare hinek bersiv bi rêz bike. Diyar e ku sînemekarên me ne gelek in. Yên ku hene jî, ji aliyê aborî ve rewşa wan ne baş e. Gava rewşa aborî ne bi hêz be, çêkirina film jî nabe. Ji aliyên din, sînemekarên ku dixwazin li ser sînemê kar bikin, piştgirên wan tune ne.

Mirov dikare hinek filmên dokument û hinek jî filmên ku bêhna Kurdewarî jê were çêbike, lê heya ku Kurdistan ava nebe, avakirina Sînema Kurdî zehmet e.

**- Yanî hûn dixwazin bêjin ku; avakirina Sînema Kurdî, di Kurdistaneke Serbixwe de dikare çareser bibe?**

- Belê, wesan e.

**- Dîtina we li Ser Yilmaz Guney û berhemên wî çi ne?**

- Bi baweriya min, ew delametekî Kurd bû ku diva hinek kar ji bo Kurdan bike. Lê rêka wî digirtin. Filmên ku çêkirine, naveroka wan weke çîroka wê dikare Kurdî be, lê gelek li ser çînayetî rawestiya ye. Ji xwe zimanê film bi xwe jî ne Kurdî ye. Bîr baweriya wî tune bû ku karibe li nava Tirkan filmê Kurdî çêbike yan jî li Ewropayê berhev bike. Lê mirov bi hindikayî dikare kul û keserên Kurd an ji hin awiran, di film de bîne zimên, Yilmaz jî bi vî awayî difikirî.

**- Bi qasî te û wî, we hev dît; dîtîna wî li ser avakirina sînema Kurdî çi bû?**

- Li gor dîtina wî hebûna Sînema Kurdî alternatîv e û baş e. Li gorî wî, pêwîst bû ku problemên Kurd di riya sînemê de bêhtir were zimên, heya ku Kurd karibin li sînema xwe xwedî derkevin û li derveyî welêt dezgehekê ava bikin, yan jî vê problemê di nava xwe de gav bi gav çareser bikin û li Kurdistanê ava bikin. Di nav çar welatên dagîrker de merov

nikare Sînema Kurdî ava bike.

**- Peywendiyên di nav sînemekarên Kurd de, nuha di çi mustewayê de ye?**

- Alaqatên di nav wan de pir ne baş e û hevkarî pir kêm e. Ji awira karê gera sînemê, bîr û baweriyên cuda jî di nava wan de heye.

Ji bilî vê, ji awira îdeolojîk jî ne wek hev difikirin. Ji ber vê yekê jî nikarin bi hev re kar bimeşînin. Çimkî Sînema Kurdî weke hemû jiyana Kurd, bi pirsa polîtîk ve girêdayî ye. Li vir divê rê baş bête dîtin; ji ber ku dîtin û alternatîvên henin li ser nehatine rawestandin, cudayî jî mezin dibin û hevkarî jî nabe.

**- Ev problem dê çawa çareser bibin?**

- Bi baweriya min heger hemû sînemekarên Kurd bawer bikin ku Milletê Kurd heye û ev maf hevbeş e, divê hewl bidin ku Kurdistanek hebe û hunera wê hebe; mirov bi hewldanê vê rastiyê dikarê bi hev re kar bike. Lê bi rastî hîna em negihiştine zanabûnek objektîv.

Ji aliyê din xelk ne xuya ye û napeyivin ku bi pêşniyar û rexneyên wan, ev kar hinekî xwe bi pêşxîne. Dema ku ev tune be, dê hemû kes bi serê xwe kar bike û kesek nabêje ev karê hate kirin, bi serketiye yan jî kêmasiyê wê hene. Divêt em li ser mesela xwe ya şexsî rawestin û xwe ji gavan re amade bikin.

**- Mirov dikare filmê Gele Gurg weke filmekî Kurdî bijmêre?**

- Belê, film bi giranî mîna filmekî Kurdî dikare bête hesibandin. Lê tekníka Rus'an lê siwar bûye, kes nikare ji sedî sed weke filmekî Kurdî bijmêre.

**- Îro bazara film çawan digere, çi curên film bêhtir kar dikin?**

- Bi rastî di vî alî de gavên mezin têne avêtin. Emerîka filmekî çedike, berî ku film derkeve, bi kampanyayên xwe yên pir alî fikrê xelkê ji bo kirîna film amade dike. Bi awayekî din Holly Wood filman ne li gor tiştên xelk dixwaze çêdike; filman çêdikin, berî ku derkeve, xelkê ji bo kirînê amade dikin û piştre jî film bi hêsanî dikeve nav gelên cewaz, tesîrê li ser xelkê dike. Mirov weke Kurd jî dikare film çêke, lê pêwîst e film, kul û kesera netewa Kurd li ser bingeha tevayê Kurdistanê bîne zimên, aktuel be.



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**Hevpeyvîna bi Mêhdî Umêd re**

***Li başûrê Kurdistanê li bajarê Kerkûk'ê hatiye dinyayê. 37 salî ye. Ji sala 1970'î û vir ve li ser karê şano û sînemayî disekine. Di sala 1984'an de li Soviet'ê dest bi Enstituya sînemayî kir, di sala 1989'an de danişgeha bilind tewaw kiriye. Li başûrê Kurdistanê di nivîsandin û leystina gelen şanoyan de, weke leystikvan, derhêner û nîvîsevan kar kiriye. Filmê (wî çêdikir) sînemê ku navê wê "Pira Delal" bû, ji ber zilm û hovîtiya rejîma Iraqê di nîvî de mabû.***

***Şanoyên wî ev in: Pîşangah (78), Seyran(şanoya zarokan 78), Kotayî derbe (bi Salman Fayiq re 70), Destanî huner (opera-72), Kirêkar (73). Umêd nuha jî li ser filmê duwem (tunel) kar dike. Di filmê Gele Gurg de ew, birêvebirê film û serekleysikvan bû. Filmê Gele Gurg filmekî sînemê ye, 35 mm'ye rengîn e, 80 deqîqe ye û ji ber çîroka Mamoste Hisêyn Arif hatiye wergirtin.***

**- Sîneme çi ye û ji welatekî re mîna Kurdistanê dikere çi rolê bileyize?**

- Bi taybetî karê sînameyî ji bo welatê me gelekî pêwîst e. Di demek wiha de, hewcedariya me gelekî bi karê hunerî heye. Em dikarin bêjin ku sîneme dikare li her welatî rola konsolosxaneyekê bileyize. Em dikarin bi riya sînemê welatê xwe li hemû deveran bidine nasîn. Bi riya sînemê em dikarin kultûr, dîrok û jiyana gelê xwe bidine nîşandan.

**- Mirov çend dikare guhdariya filmekî bike, yan jî normê film çiqas dirêj e?**

- Ev gelek caran li ser naveroka film dimîne. Lê ez dikarim bêjim ku filmê normal 90 deqîqe ye. Ev norm, normê herî îdeal e. Yanî mirovek bi rehetî dikare 90 deqîqe li filmekî temaşe bike.

**- Gava em van kar û xebata we weke binaxa Sînema Kurdî pipejirînin; pirsgirêkên ku dê werine pêşiya we dê çêbin?**

- Ez duxwazim li ser vê pirsê, xal bi xal bisekinim.

**Problema personel:** Bi taybetî kêmasiyên me ji aliyê leystikvanan hene. Leystikvanên me kêmin û yên ku henin jî, piştî demekê rudinin. Gava mirov kar neke nikare bijî, gava karê me yê hunerî bi şêweyekî sîstematîk neyê meşandin, hunermendên baş dernakevin. Kêmasiyên me li

pişt kamera (derhêner, filmhelgêr) jî hene. Ne bi hêviyan lê bi kar Sînema Kurdî ava dibe, pêş dikeve. Netewa Kurd pêwistiya wê bi Sînema Kurdî heye. Sîneme jî şixûkêran dixwaze. Şixukêr jî bê perwerde çênabin. Divê keç û xortên me di vî alî de xwe bighêjînin û bixwînin. Bi rastî heya niha sînemekarên keç tune ne ku bileyizin. Eger mabesta me welatek serbixwe be, pêwist e ji awira hunerî ve jî em xwe bi pêş bixînin, ji bo dezgehên hunerî em ji niha ve bingehên esasî deynin.

**Problema ekonomîk:** Gava serkevtin di karê sînemayî de bête xwestin, divê ji aliyê ekonomik ve problemên heyîn hatibin çareserkirin. Di vî alî de ji bo fînansekirina sînemê ez du (2) riyan dibînim. Hêzên me, yan jî dewlemendên me. Bi van re piştgiriya gel jî pêwîst e.

**Belavkirin:** gava ev pirs îro ji bo Sînema Kurdî ne aktuel be jî, dê di pêşe rojê de aktuel bibe. Diyar e ku filmên çêdibin ji bo nîşandanê ne, ji bo ger û belavkirina wan jî organîzeyek pêwîst e. Divê ji niha ve em li ser vê yekê jî bisekinin.

**- Em dixwazin hinekî li ser kêmasiyên sînemekarên Kurd bisekinin...**

- Bi rastî ev pirs, pêwîst e bête munaqeşekirin. Ez dixwazim tiştên ku nuha têne bîra min, bi rêz bikim. Hinek Kurd hene, gava pirtûkekê li ser pirsa sînemê dixwînin dikarin xwe mîna sînemekarek bijmêrin. Hinek jî hene, hinekî bi karê sînemayî daketine, bi çavekî herî pispor li xwe dinêrin, bi rastî ez di wan mirovan de naghêjim! Divê em li ser van pirsan û ya xweyî kesîtî bisekinin.

Ez dikarim bêjim ku rexnegirî li ser sînemekarên Kurd yan jî Sînema Kurdî tune ye. Heger rexnegir tune bin, dê avakirina Sînema Kurdî bi rastî dê derengtir bibe. Kesê rexnegirê vî karî jî, divêt li ser vî karî têr û tije be. Hunermendên millet divêt gelekî dil paqij bin, ji bo hunermendên bi vî rengî çêbibin, rexnegirî dikare roleke pir mezin bileyize.

**- Bi baweriya we, alaqatê di nav hunermendan de gerek çawan be?**

- Peywendiyên di nava hunermendan de li her welatekî heye. Lê her millet xwedî tore û adetên cewaz in. Em hinekî zû hêrs dibin û qet rexna qebûl nakin. Peywendiyên di nav hunermendên Kurd de ne runiştiye. Gelek caran em têne

tenişta hev, lê gava qala kar dibe, em nikarin bi hev re grûbeke kar ava bikin. Yan jî heya em grubeke ava dikin, em çend civînan de derbas dibin.

Ez li gor tecrubeyên xwe dikarim bêjim ku ev çend sal in, me xwestiye bi hev re em kar bikin, li mixabin e ku berjewendiyên şexsî derketine pêş, piştre kar sekiniye.

Ji berjewendiyan bêhtir, pêwîst e em weke Kurd bifikirin, kar û xebata xwe bikin. Ew kesên ku peyva Kurd ji devê wan nakevin, divê têkevin nav kar û dev ji berjewendiyên şexsî berdin. Gring e ku em gavên dîrokî bavêjin, bersiva demê bidin, rast bin û xwe ji xeletiyan rizgar bikin.

**- Dîtina we li ser Yilmaz Guney çi ye?**

- Yilmaz, miroveki gelek aza û pak bû. Ji xwe sîneme jî mirovên wiha dixwaze. Ew gihabû misteweyeke pir bilind ku bi riya sînemê dikarî bû tiştên pêwîst bighîne. Merovek rewşenbîr bû û beşek ji jiyana xwe, li ser dîtînên xwe di zindanan de derbas kir. Ew nimûneyeke berçav e ku Kurd her ne bi şerê çekdarî lê ew dikare di karê hunerî de jî xwedî deng be. Wî dikarî bû Sînema Kurdî ava bike, lê jiyana wî têr ne kir. Yilmaz Guney Kurd e, çîrokên filmên wî bi gelekî ji Kurdistanê hatine wergirtin, lê filmên wî ji bo Sînema Tirkî têne jimartin, ev tişt me xemgîn dike.

Bi baweriya min pêwîst e rewşenbîr û sînemekarên Kurd hewldaneke pir mezin bikin ku em film û dîroka wî bikin binaxa ji bo Sînema Kurdî. Divêt em hewl bidin ku piştgiriyê ji cîhanê wergirin da ku filmên wî ji Tirkan re nebe mal. Ji bo vê yekê jî divê em têkiliyên xwe bi sînemekarên dinyayê re deynin. Heya ku filmên wî nebe binaxe ji bo Sînema Kurdî û Yilmaz newe mala xwe ya eslî, dê çavên wî vekirî bimîne.

•••

## Hevpeyvîna bi Salman Fayiq re

***Ew li başûrê Kurdistanê, li bajarê Kerkûkê hatiye dinyê, 47 salî ye. Piştî xwendina seretayî, ji bo cara yekem, li Kerkûkê di dibistanên şano û perwerdikirina karê sînemayî de derbas bûye. Di wan deman de weke derhêner, leystikvan û nivîskar, di gelek şanoyan de rol wergirtiye. Piştre derbasî Romanya dibe û li wir danişgeha bilind ya sînemayî tewaw***

***dike. Piştre doktora dike.***

***Filmên video, "Aso" û "Çarenivîs" ji teref wî ve hatine amadekirin. Çend nimûnên şanoyê wî yê bi nirx ev in: Kirkoyî teze (72), Dirk û dal (73), Kotayî Derbe (70), Şehîd (operet, 73). Cara yekem li Kurdistanê bi kamera tv. ew, li gund û bajaran geriya ye û derd û kesera gelî anîye zimên. Nuha li ser hin fîlmê video kar dike.***

**- Hebûna sînemê dikare çi rolek ji bo me bileyize?**

- Sîneme navgînek ragihandiniyê ye û ji bo belavkirina îdeolojiya mirovan, dikare roleke mezin bileyize. Em dikarin bi vî karî herine nav hemû gelan, em kî ne, çi daxwaz dikin, çi dikin û hewldana me ji bo çi ye. Em dikarin vî karî bi her şêweyekî ji bo berjewendiyên gelê xwe bi kar bînin.

**- Sibê li pêşiya Sînema Kurdî dê çi pirsgirêk (problem) derkevin?**

- Ji ber ku me welat nîne, mecalên ekonomîk pir bi sinor in, personelên pêwîst pir hindik in, hêj Sînema Kurdî ava ne bûye. Ev tevde li pêşiya me ye, lê kelemê herî mezin pirsa ekonomîk e, ji ber ku karê sînemayî gelek pere jêra dive!

**- Gere alaqatê di nav hunermendan de çawa bin?**

- Divêt em li wî welatî bifikirin ku pêwîstiya wê bi karê hunerî pir heye. Em dest bidin hev û têkevine nav kar. Pêwîst e rêzdariya li hember hev pir germtir be û hemû kes bêhtir bi karê xwe dakeve. Ew welatê ku di nav xwînê de her roj dimîne, divêt qet ji bîra me neçe.

**- Hunermendên me bersiva dema xwe didin yan na?**

- Ev hewldana ku heye ne bes e. Divêt bêhtir be. Her hunermend, li hember bûyerên welatî divêt xwedî helwêst be. Kesên ku dibin penaber, nefî dibin û di qirkiran de derbas dibin, divêt herdem ew, di bîra me de bin.

**- Dîtina we li ser Yilmaz Guney çi ye?**

- Li ser wî pir tişt hatine gotin û diyar e ku dê hîna jî bên gotin ku Kurd e yan na? Lê bi baweriya min, wî qet gelê xwe jibîr ne kiriye û di filmên xwe de, pir alî kesera gelê Kurd aniye zimên. Ew hinekî jî malê mirovantiyê ye. Ji awira sînemayî ve pir serketî bû.

Institut kurde de Paris

**- Filmek normal çend deqe ye?**

- Filmê serketî ewe ku, bîr û baweriya mirov bixwaze bide derve û baş hatibe formulekirin.

**- Bazara film di destê çi welatan de ye?**

- Emerîka û piştre jî Ewropa serî dikşînin. Hinek nakokî nuha di navbera Emerîka û Ewropa de heye. Hewldana Sînema Ewropa ewe ku *"bazara filmê Ewropa"* çêbikin.

**- Naveroka filman çawan bin ku baştir bêne firotin?**

- Li ser hêza belavkirina film dimîne. Gelek film îro têne firotin, tên girtin, naveroka wan, dram komedî yan jî trajîk e. Lê filmê ku bêhtir têne firotin sentînental in.

•••

**Hevpeyvîna bi Fethî Kerîm re**

***Li başûrê Kurdistanê li bajarê Hewlêrê hatiye dinyayê, 35 salî ye. Ji sala 1976'an vir ve li ser şano kar dike. Piştre derdikeve derveyî welêt û nuha li Stockholmê danişgeha bilind ya sînemayî dixwîne. Her wiha diçe dibistaneke taybetî ya sînemayî. Şanoyên ku têde rol wergirtiye ev in: Zor kira be doktor (81), Ey ew kesên le wê ye (80), Qalay dim-dim (81), Xanzadekir (82), Kele sor (87). Di filmê Gele Gurg de jî alîkarê derhêner bû. Li ser hin filmên dokument jî kar kiriye.***

**- Hebûna sînemê dikare çi karî bighêjîne me?**

- Ji bo rizgariyê rola sînemê pir e. Ji awira polîtîk û ekonomîk dikare piştgireke pir mezin be. Ji xwe sîneme jî mîna navgînên din yê ragihandinê, pêwîst e bi karê polîtîkî re bimeşe heya rizgariyê. Mecalên me yên ekonomîk zêde tune û ji aliyê din ve, li welatê xwe em nikarin nuha Sînema Kurdî ava bikin. Her wekî çawa rojnameya Kurdî ya yekem li derveyî welat derket, Sînema Kurdî jî nuha bi vî awayî ye. Her çend hinek filmên Kurdî çêbûne jî, vê kêliyê em nikarin bêjin Sînema Kurdî heye. Lê ev dikare bibe gavê pêşî yan jî binaxe. Pêwîst e heya serkevtinê em nesekinin û filman çêbikin, da ku bibe binaxa Sînema Kurdî.

Institut kurde de Paris

**- Gava em van xebatên we mîna binaxek qebûl bikin, sibê dê çi pirsgirêk werine pêşiya Sînema Kurdî?**

- Diyar e ku dê pirsgirêk pir bin. Bi baweriya min bê welat bûn derdekî herî mezin e. Ji ber ku karê sînemayî dezgeheke runiştî dixwaze. Dikare instutiyek ji bo vî karî vebe da ku ji serî ve piştgiriya aborî bike. Weke tê zanîn ji bo filmekî baş, bi milyaran peran dirijînin. Tê wê wateyê ku filmê bi qelîte, hinekî jî berê xwe dide pirsa aborî, pê ve girêdayî ye.

Sîneme, leystikvan û personelên pişt kamera dixwaze, ez dikarim bêjim ku di vî alî de jî problemên me yên mezin hene. Ev problem, di welatekî serbixwe de çareser dibe. Lê pêwîst e neyê wê wateyê ku gerek mirov rûne. Gelê Kurd pir dereng maye, divêt cihê xwe di nav netewên din, ji awira karê sînemayî jî hêdî hêdî bigre.

Pirsa belavkirina filman îro ne aktuel be jî, dê sibe were pêşiya me. Divêt ji nuha ve em li ser vê pirsê bisekinin. Welatê mezin, bazara filman di destê xwe de digre û şens nade filmên din. Gava em bi filmê qelîte nekevine nav wan û ji nuha ve rêyek çênekin, sibê em dê kevine tengasiya belavkirinê.

**- Alaqatên di nav hunermendan çawan bin, baş e?**

- Ji ber karê sînemayî karekî kolektif e, alaqatê baş dixwaze. Karê şanogerî jî wiha ye. Pêwîst e em li ser xeletiyên xwe bisekinin. Anku di karê sînemayî de pêwendî karekî esasî ye û divêt em kolektîvîzmê esas bigrin, heya ku gavên xwe bihavêjin.

**- Dîtina we li ser Yilmaz Gûney çi ye?**

- Ew serwetek mezin bû. Her ne ji bo Kurdan tenê lê ji bo mirovantiyê jî karên mezin kir. Di gelek filmên wî de, jiyana gelê Kurd û mirovantî hebû. Pispor bû û bi pisporî kar dimeşand. Îro ew li jiyanê ba, dê gelek tiştên din emê jê fêr bûba.

**- Îro bazara film di destê çi welatî de ye?**

- Bazara film îro di destê Emerîka de ye, yanî Holly Wood. Giraniya filmên Emerîkî, li gelek welatan xuya ye, li Arjantîn ji % 90, li Şîlî % 70, li Brezîlya %70 û li Rojhilata navîn û Ewropayê jî, bi giranî filmên wan e.

□ Hevpeyvîn tev di sala 1991-92'an de, ji bo Rojnameya Yeni Ulke hatibûn çêkirin.

Institut kurde de Paris

# Yilmaz Guney

Bi eslê xwe ji bakurê Kurdistan e û li Sîweregê (Girê Sor) di sala 1937'an de hatiye dinyayê. Di dema xwendina xwe de, car carna nivîsan dinîvisîne û di ber de jî filmê sînemê li gundan digerîne. Di sala 1958' an de dest bi karê sînemayî dike û bi Dar film re protokelekî çêdike. Ji ber nivîsên xwe di salên 1961-62'an de di hapsê de dimîne. Bi derketina wî re pirtûka **"Boynu bükük öldüler"** ji çapê derdikeve. Di sala 1969'an bi filmê **"Seyidhan"** navê wî belav dibe. Di 12 Adara 1971'de mîna gelek şoreşgeran ew jî tê girtin û heya 1974'an di hepsê de dimîne. Bi derketina wî ve, pirtûka wiyî **"Hücrem"** derdikeve. Piştî filmê **"Arkadaş"** filmê **"Endişe"** tê, di vê navberê de, endamekî dadgeha Tirk provakisyonekê derdixe û ew kes tê kuştin, Yilmaz weke qatilê wî tê girtin û mehkumkirin.

Li hepsê jî karê sînemayî didomîne. Piştî demekê bazdide derveyî welêt û li Fransayê bi cîh dibe. Li wê derê filmê **"Yol"** û **"Duvar"** çêdike û di sala 1984'an de, li xerîbiyê diçe ser heqiya xwe.

**Nivîskar Yilmaz**

Yilmaz rewşenbîrek hêja bû. Gelek pirtûk di duv xwe de hiştin. Gava em bixwazin hineka ji van bijmêrin dê van werin bîra merov: **Salpa(1975),Sanık(1975),SiyasalYazılar I.-II. (1985), Faşizm uzerine(1979), Soba, Pencere camı, iki ekmekistiyoruz,OglumaHikayeler.**

Senaryoyê ku ji bo filman nivîsandine, gelek ji wan mîna pirtûk derketiye, weke nimûne, **Arkadaş...**

**Yilmaz Serxwebûnxwaz**

Ew serxwebûnxwaz bû. Ev dîtinên xwe di gelek komcivînan de diyar kirine. Nivîskarê Tirk Atilla Dorsay di pirtûka xweyî "*Yilmaz Guney'in kitabı*" de, rexneyek wesan li Yilmaz digre: "*Yilmaz nigên xwe zêdî qalibê xwe dirêj dike. Qet ji ser ya xwe danakeve. Li hember birêvebirên dolivgeriyê (Tirk) jî wesan bû. Ji dîtinên xwe yên ramyarî-ku dirêjî Mao, Enver Xoce dibe û di van salên dawîn de ku li ser hinek pirsan (Kurdistan) disekinî-serêşan dida dewletê.*

*Nakokî bi taybetî li ser pirsa Kurd bû. Her çend di van salên dawiyê de Yilmaz digot 'ez Kurd im', nêzîkî pirsa Kurdî dibû û weke rewşenbîrekî ji awira karê çandî, aborî ve bi pirsa Kurdî dadiket jî, ev karekî normal e... Lê*



Institut kurde de Paris

*sloganên wî ji bo 'Kurdistaneke Serbixwe' û 'Rizgarî ji bo Kurd an' mirov şaş dike, merov tê naghêje!*

*Pêwîst bû bizana ku dewlet li van tiştan bi nexweşî dinere. Welatên Ewropayê jî, ji veqetandinên li gor dîtina wî hez nake.*

*Lê ez vê hişkbûna wî, dişibînim ya Enver Xoce. Weke ku herdem ez dinivîsim û dibêjim, dê ji niha û pêve ew, pişta xwe bide hemû dîtinan û livbaziyan, em ê ji niha û pêve nema li dîtinên wî yên polîtîkî û pratîkî binêrin. Em ê, her bi çavê hunermendek ku gelek pirtûk nivîsandine lê binêrin. Welatê wî tim, ji bo karê wî, ji vê awirê, wê wî bîne bîra xwe..."*

Li vir gelek tişt zelal têne xuyakirin, dijmin Yilmazekî pir pasîf û sinorkirî dixwaze.

**Hunermend Yilmaz**

Yilmaz Hunermendekî serkevtî bû. Mirov dikare ji di awiran li ser vî aliyê wî raweste:

*1- Dîtînên wî li ser hunerê û hunermendiyê*
*2- Filmên ku çekirine û hwd.*

**Dîtinên wî li ser huner û hunermendiyê**

Gelek caran rojnamevan pêre runiştine û hevpeyvîn çêkirine. Wî bi xwe jî gelek car li ser Huner û hunermendiyê nivîsandiye. Ji ber ku xebata me li ser berhemên Yilmaz pir alî ye, di vê pirtûkê de em nikarin cîh bidine dîtinên tevan ku li ser huner û hunermendiyê ne. Lê me cîh da hinek nimûnên berçav.

**"Sînemekar ew kes e ku tiştên belavbuyî yê gelî tîne ser hev û dike berhem. Dike wêne, deng didiyê û belav dike. Gava ev dîtin bête belavkirin, pêwîst e wazîfên xwe yên dîrokî jibîr neke. Kêmasiyên me ew bû ku, di karê berî nuha de, me ev rê ne girt".**

**"Filmên ku ji nuha û pê ve em çêkin, weke naveroka xwe dê pir giran bin. Ji bo gelê xwe, emê filmên herî bi nirx çêbikin. Filmên me dê li gor berjewendiyên gelê me be û riya wan ronahî bike".**

**"Karekî dîrokî li pêşiya me ye. Divê bi her şêweyî şerê me li hember imperyalîzmê be, ji ber ku wan welatê me xistiye vêhejartiyê".**

**"Ji bo ku sînemekar bi nav be û navê wî ji cîhanê hinda ne be, pêwîst e ku gelê xwe baş binase, bi awayekî din ku mirov bîne zimên, divê xwe baş binas e".**

Institut kurde de Paris

"Pêwîstiya gel bi çi heye û em çawa dikarin kar bikindivê em li ser van pirsan bêhtir rawestin, karê din bihêlin yê duwem"

"Dadgehkirina herî mezin û bi nirx ya gelî ye. Ji ber vê yekê jî, gava em filman çêdikin, em vê xala bingehîn jibîr nakin. Gava em peyvekî tevlî filmên xwe dikin, em gelekî li ser wan peyvan radiwestin û çend caran di çav re derbas dikin".

"Hunermendê herî bi nirx ewe ku ji nêz ve li ser pirsa welatê xwe ya aborî û ramyarî bisekine. Gava ku hunermend xwe ji van bi dûrbixîne, hunermendiya wî namîne. Dê bimîne mîna hunermendê pir diaxive lê qet kar nake".

**Filmên ku çêkirine**

Yilmaz di hemû jiyana xwe de, di 113 film an de-pir caran weke serekleystikvan, carna senaryoya wê (çîroka film) nivîsî ye û gelek caran jî birêvebiriya film kiriye-di çêkirina filman de rolên cewaz girtiye ser milên xwe.

Weke tê xuyakirin, Ew di axavtina xwe de û di jiyana xwe ya pratîkî dejî, hunermendekî hêja û pir alî bû.

Ji serî ve mîna sînemekarekî profesyonel kar kiriye. Ji ber vê yekê jî piştî çend filmên wî hatiye naskirin û ew bûye "Qralê Krêt" yê nemir.

Nuha jî em dixwazin yek bi yek li ser filmê wî bisekinin û ji çend awirên cewaz wan di çav re derbas bikin. Me filmên wî tev bi dest nexistin. Ji ber vê yekê jî, dê nirxandina me bêhtir li ser wan filmên di destê me de be.

Ji bo ku xwendevan li ser filmên din (yê me peyde ne kir) bibe xwedî înformasyon, li ser bingeha hinek kaniyên din, me qala wan jî pir bi kurtî kiriye.

Institut kurde de Paris

# Nirxandinek bi tevayî li ser filmên Yilmaz Gûney

Di filmên wî de jiyana Kurdan pir alî heye. Car carna di bin hikariya wê demê û sînemekarên wê demê de maye, weke nimûne di sala 1965'an de filmên polîsî aktuel bûn, Yilmaz jî mîna gelekan di filmên polîsî de rol wergirtiye an jî senaryok wesan nivîsandiye.

Hinek kes rexne lê digrin, ji ber ku di hin filmên wî de neteweperestiya Tirk derdikeve pêş. Lê ev rexne hinekî ne di cîh de ne. Ji ber ku senaryoya wan filman ne wî nivîsandiye, di wan filman de weke leystikvanekî duwem e. Her wesan ew film, filmên wî yê destpêkê ne û tu alternatîfên zêde tune ne ku senaryoyên xwe têxe jiyanê.

Ji xwe di destpêka derketina wî de, wî; bi rabûn û rûniştina xwe, bi şexsiyeta xwe, weke mirovekî Kurd xwe jimartiye. Ev tişt di filmên wî de jî xuya dike. Guhertina paşnavê wî ku kiriye Güney (başûrê Anatolia-bakurê Kurdistan), bi serê xwe delîlek Kurdbûnê ye.

Piştî ku Yilmaz dibe otorîte û kesek bi navdar, senaryoyên xwe dixe jiyanê. Divê mirov bala xwe baş bide wan filmên wî. Ji ber ku ev film dikarin pir alî, alîkariya me bikin, ku ew çend Kurdistanî bû.

Di hinek filmên wî de pirsa çînayetî xwe dide xuya kirin. Lê ev bi şêweyekî pisporîk, bi jiyana Kurdan ve hatiye girêdan. Yanî pirsa çînayetî bi serê xwe dernexistiye pêş. Ji xwe di salên dawiyê de, ev tişt heşkeretir dibe.

Ji awira hunerî ve, ji serî ve xwedî gewhereke taybetî bû. Piştî demeke din, pêşveçûnên mezin li cem çêdibin û qalibê xwe derbas dike. Gava di nava film de mirov lê dinere, rola xwe bê kêmasî dike û konsantrasiyoneke seyr (ecêp) li cem heye. Lewma ku, piştî çend filman navê wî belav dibe.

Institut kurde de Paris

Nuha em ê yek bi yek li ser filmên wî bisekinin. Weke ku tê zanîn hinek ji filmên wî, piştî cunta 12'ê îlonê, hatibûn şewitandin. Ji ber vê yekê filmên me bi dest ne xistin hene. Lê weke ku me berî nuha jî diyar kiribû, em ê qala wan filman jî bi kurtî bikin. Filmên ku senaryoya wê ji teref Yilmaz ve ne hatibe nivîsîn, me pêwîstî nedît ku qala naveroka film, bi dirêjahî bikin.

**Zaroyên vê niştimanê**

Me ev film bi dest ne xist. Film di sala 1958'an de hatiye çêkirin. Yilmaz di film de, serekleystikvan e û bi Atıf Yılmaz re, senaryoya film nivîsandiye.

Çîroka wê, ji dema şerê di navbera Kemal Paşa û siltanên Osmanliyan de hatiye wergirtin. Bûyer li Dilûk'ê derbas dibe. Grûpek dixwaze nameyekê bighêjîne aliyê Kemal Paşa, lê rewşa wan nexweş dibe. Yilmaz li wir alîkariya grupê dike.

**Xezala gewr**

Ji çîrokên Yaşar Kemal hatiye wergirtin. Senaryoya film ji aliyê 3 kesan ve hatiye amadekirin. Yek ji wan kesan Yilmaz e. Film di sala 1958'an hatiye kişandin. Alî (Y) bi dergistiye û bi nêçîra xezalan mijûl dibe. Axayê wê tarê dil dikeve dergistiya wî. Şer di navbeyna herdu aliyan de derdikeve, axa bi fen-dik û dolaban daketiye...

Di film de dîlanên folklorî yên Kurdî, lebta Alî û girêdana bi adet û tor'an ve, tev ji jiyana Kurdan hatiye girtin. Alî di film de têra xwe serkevtî ye, lewma di film festîvala Tirkan de ya sala 1959'an de xelat wergirt.

**Dema tûtinê**

Ji romana Necati Cumali hatiye wergirtin. Di sala 1959'an de hatiye kişandin. Filmek li ser evîniyê ye.

Cemal (Y) dil dikeve keçek ku erdê wan nêzî hev in. Lê bavê wê soza xwe bi yekî din re daye. Dawiyê Cemal

Institut kurde de Paris

qîzikê direvîne. Cenderme wan digrin. Piştî demekê herdu dighêjin hev.

**Herdû jî mirov in mêr bûn**

Di sala 1963'an de hatiye çêkirin. Senaryoya film ji aliyê Yilmaz ve hatiye nivîsîn.

Alî Duran (Y) nuh ji hepsê derketiye. Lê di bin kontrola polîs de ye û pêwîst e li bajarê ku lê ye, her ro xwe nîşanî polîs bike. Kesekî din ji rûniştvanê bajêr ku belekir e, ji ber sedemên fesadiyê, ew û Alî dikevin qirika hev. Nexweşî di navbeyna wî û Alî de xurttir dibe. Alî her çiqasî bêrya dayika xwe kiribe jî, ji ber ku di pevçûnê de brîndar dibe û duv re jî... dayika xwe nabîne.

Girêdana dayika wî, di wêne de weke Kurdan e. Hesreta dê û law, a zindaniyê, weke tore û jiyana Kurdan hatiye fikirkirin.

Film ji awira Alî û leystikvanên din jî têra xwe serkevtiye. Pêdaketina Alî bi keçka biçûk ve, di film de balkêş e. Filmekî dramatîk e.

**Girtiyên bê qeyd û bend**

Film di sala 1964'an de hatiye kişandin. Senaryoya film ji teref kesekî din û Yilmaz hatiye nivîsîn.

Rifat (Y) ji hepsê derdikeve û bi hêviyên mezin tê malê. Lê rewş li gund ne xweş e û axa li ser sitem û zilma xwe berdewam e. Rifat dil ketiye qîza axa, lê ji ber ku çi dermanî nabîne, diçe bajêr. Berê xwe dide mala hevalê xwe, ku li zindanê hev naskiribûn. Dayka wî dibîne û emanetekê jê distîne. Ev pereyek baş e. Rifat pê qemyonekê dikire û dest bi kar dike. Riya Rifat dikeve gund û ew û axa pev diçin, di wê navberê de axa di bin nigên trektorê de dimênê. Hezkiriya wî jî dîn dibe. Gundî ji zilma axa rizgar dibin.

Zilmiya axa bi pir alî dişibe jiyana li Kurdistanê. Evîndarî û merdbûna Rifat jî, bi giranî weke Kurdekî



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHEQUE

hatiye neqişandin. Ji awira hunerî ve ji pir aliyan ne serkevtiye. Ji bilî Rifat û axa pê ve, yên din baş bi rola xwe ranebûne. Eleqatê di nav Yilmaz û kurkê biçûk, ji awira hevaltiyê ve balkêş e.

**Deh kesên bê tirs**

Film di sala 1964'an de hatiye kişandin. Ji ber ku Yilmaz di film de mîna leystikvanek ji dorê ye (duwem, sewem) û di çêkirina senaryoyê de çi rola wî tine ye, me pêwîstî nedît ku li ser vî filmî rawestin.

**Xortê mîna berê tivingê**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Di sala 1964'an de hatiye kişandin. Me film bi dest ne xist.

**Deftera Leylaqî**

Di sala 1964'an de hatiye kişandin. Ji ber nivîsek Çetin Altan hatiye girtin. Yilmaz di film de serekleystikvan e .

**Ji Helîmayê nameyek hatiye**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Film ji ber romana Alexandre Dumas hatiye girtin. Di sala 1964'an de hatiye kişandin.

**Zeybekê bi xencer**

Yilmaz di film de serekleystikvan e û senaryoya wê nivîsandiye. Lê me ev film peyda nekir.

Lawê axa dil dikeve qîzekî feqîr. Lê malbata qîzê, qîza xwe nadin lawê axa. Axa gazî zeybekî (Y) dike da ku alikariya wî bike. Zeybek qîzê direvîne. Lê nade axa, ji ber ku birayê wî dil dikeve qîzê, dide wî. Mirovên axa, birayê zeybek dikujin. Şerek mezin di navbera zeybek û axa de peyda dibe, zeybek û qîz dizewice.

Film di sala 1964'an de hatibû kişandin.

Institut kurde de Paris

**Şahînê reş**

Film ji ber filmê Zoro, *"Rouben Mamoulion-The mark of Zoro"* hatiye girtin û di sala 1964'an de hatiye çêkirin. Yilmaz wekî serekleystikvan têde dileyize.

**Koçero**

Merov dikare bêje ku Koçero bûye sedemek berçav ji bo nasîna Yilmaz. Koçero bi xwe jî kesekî Kurd e û rêbirek bi nav û deng e. Li ser bingeha jiyana Koçero ev film hatiye çêkirin.

Ji bilî ziman, filmekî Kurdî ye. Film di sala 1964'an de hatiye kişandin. Senaryoya film ji teref Yilmaz ve hatiye nivîsîn û ew tê de serekleystikvan e.

Koçero bavê hejaran e. Dijminê axayên zilmkar e. Koçero tê girtin. Axa, xwîşka Koçero direvîne. Li ser vê yekê Koçero ji hepsê bazdide. Cezeyekê mezin dide axa û derdikeve çiyê. Di dawiya film de, di şerekî de Koçero tê kuştin.

Filmê Koçero ji awira leystikvanan jî pir serkevtî ye. Mirov dikare bêje ku, di wan salan de filmek herî bi nirx bû.

**Dehbe**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Film di sala 1964'an de hatiye kişandin. Filmek li ser evîniyê ye.

**Ji bilî mirina her roj**

Film ji ber romana Dostoyevski ya "Suç û Ceze" hatiye girtin. Amadekirina senaryo ji bo film, ji aliyê Yilmaz ve hatiye amadekirin û di sala 1964'an de hatiye kişandin.

**Genimê bi xwîn**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Di sala 1965'an de hatiye kişandin. Filmek li ser xwîniyê ye.

**Recebê ji Qasimpaşa / Qasimpaşayî**

Senaryoya herdu filman ji aliyê Yilmaz ve hatiye nivîsîn. Film bi naveroka xwe, li ser belekiriyê ye.

Recep mirovekî belakir e û quremêrekî bi nav e. Film bi tevayî li ser şerê belakir û quremêrên dora Stenbolê hatiye avakirin.

Yilmaz di bin hikariya filmên wê demê de maye. Ji ber ku di wan salan de filmê wesan çêtir bala temaşevanan dikşand. Film di sala 1965'an de hatine kişandin. Leystikvan hemû, ji awira belekiriyê ve serkevtî ne.

**Araqvexwêr**

Film ji ber filmê George Stevens"*Shane*" hatiye girtin. Yilmaz senaryoya film hinekî din fireh kiriye. Di sala 1965'an de hatiye kişandin. Araqvexur (Y) kesekî xerîb e. Riya wî bi gundekî digund de, di nava axa û mirovek feqîrde nakokî hene. Yilmaz alîkariya xwe pêşkêşî malbata ketî dike.

**Siwarê hespê gewr**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin.

**Torpîdo Yilmaz**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Bingeha film li ser belekiriyê ye.

**Qertelê brîndar**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Çîroka film, ji dema Osmanliyan ve hatiye girtin. Yilmaz di film de diçe heyfa bavê xwe.

**Çûkê dilşadî**

Film ji ber filmekî hindî hatiye wergirtin, Yilmaz se-



Institut kurde de Paris

rekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Naveroka wê li ser evînî û sextekariyê ye.

**Ezê we hersiyan gulebaran bikim**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Film li ser pirsa xwîniyê disekine. Yilmaz ji awira zanabûna pirsa xwîniyê, ji ber ku pir tiştan dizane, bi rola xwe, pir alî radibe.

**Mirovê bi tehluke**

Yilmaz serekleysikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Ew di rola mahkumê mirinê de ye û ji hepsê bazdide da ku qesasê eslî bigre.

**Qralê qralan**

Senaryoya film ji teref Yilmaz ve hatiye nivîsîn, di film de serekleystikvan e. Film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Film li ser îxanetê û hevaltiyê hatiye çêkirin. Murat (Y) piştî şelandinê tê girtin. Hevalên wî tev dewlemend dibin. Piştî çend salên din, Murat ji zîndanê derdikeve û tê paya xwe dixwaze. Şer di navbera wan de derdikeve.

**Dest nede bac û xaraca min**

Ew di film de serekleystikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Film li ser binaxa pêxwas û quremêrên di dema Osmanliyan de hatiye çêkirin û nakokiyên di nav wan de tîne zimên.

Yilmaz di film de, li ser kuştina birayê xwe dibe belekirek bi nav û deng.

**Belekirên li ber çav**

Yilmaz di film de serekleystikavn e. Film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Berdewama filmê *"Dest nede bac û xaraca min"* e.

**Dawudo**

Çîroka film ji Kurdistanê ye. Li hemberî zilm û zordariya axa ye. Dawudo, bi mêraniyeke mezin li hemberî axa û kesên nebaş şer dike.

Di sala 1965'an de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e.

**Sundxwariyê çeka bûm**

Di film de serekleysikvan e û film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Naveroka film li ser pirsa xwîniyê ye.

**Xwîn cendekan li ber xwe dibe**

Filmek polîsi ye. Ji ber ku di wan salan de filmên polisî kar dikirin û balkêş bûn, Yilmaz jî di hinek filmên wesan de leyistiye û têra xwe serkevtiye.

Film di sala 1965'an de hatiye kişandin, Yilmaz serekleystikvan e.

**Ber'a ku kul û keseran vedide**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Navoraka film polîsî ye.

**Neviyên çiyan**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Naveroka film li ser şelandin û hevaltiyê ye.

**Kesên bê tirs**

Ji ber filmê John sturges *"the gunfight at o.k corol"* hatiye girtin. Yilmaz serekleystikvan e. Film di sala 1965'an de hatiye kişandin.

**Li kuçan xwîn hebû**

Film di sala 1965'an de hatiye kişandin. Yilmaz serek-

leystikvan e. Naveroka film li ser rojnamevaniya bi namus e.

**Ez bi mirina dijîm**

Naveroka film li ser pirsa xwîniyê ye. Ahmet (Y) bi xwe lawê yekî xwînî ye. Ji bo ku tevlu karê xwîniyê nebe tê bajêr, lê dijwariya jiyanê li wir jî, dev ji wî bernadê...

Film di sala 1965'an de hatiye kişandin, Yilmaz di film de serekleystikvan e.

**...û xatir ji çekan hate xwestin**

Filmek polîsî ye û di sala 1966'an hatiye çêkirin. Yilmaz di film de serekleystikvan e.

**Kerîmo**

Film ji ber çîroka Yordan Yorkov hatiye wergirtin. Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1966'an de hatiye çêkirin. Film li ser şerê di navbera rêbir Kerîmo û kesên ne baş de derbas dibe.

**Şêrê serê heft çiyan / vegera şêran**

Ev herdu film berdewama hev in. Yilmaz serekleystikvan e û senaroya wan bi xwe nivîsîne. Film di sala 1966'an de hatine kişandin.

Naveroka wan, dema bi cîhbûna Tirkan li Anatolia û şerê di navbeyna wan û Bîzansiyan tîne zimên.

**Bêkes (Mirovê bi tenê)**

Film di sala 1966'an de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e. Naveroka film, evînî û serguzarî ye.

**Selîmê mîna rovî**

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn û ew serekleystikvan e. Film di sala 1966'an de hatiye kişandin. Naveroka film polîsî û serguzarî ye.

Institut kurde de Paris

Yilmaz di rola polîs de xuyanî dike û hewl dide ku qatilê jinekî derxîne. Dawî, şopa wan peyde dike û şer di navbeyna wan de dest pê dike.

Di film de Kurdbûna Yilmaz ji gelek awira xwe dide pêş. Em dixwazin ji nava film hinek dîmenan bînîne zimên:

Yilmaz di destpêka film de, bi jinekî re qise dike, ku ew jin dosta wî ye:

**- Tu dixwazî em herine Çîn'ê? Brinca wir pir bi nav û deng e. Gava di ber brincê re hinek fasoliya hişk jî hebe, tiştek xweştir jê tune.**

*- Çîn! Na wile Çîn gelekî dur e.*

**- Nexwe em herine Amed'ê.**

*- Amed'ê! Xwedê merov bistirîne. Çi karê min li wir heye?! Merovên simbêl geş û bi şerwal li wir hene. Her yek ji wan merovan, çekek di ber de ye. Xwedê qet riya min nexe wir!*

**- Zu here ji ber çavên min!**

*- Çi bû, ji bo çi tu wiha hêrs bûyî?*

**- Ji xwe re li qisê wê bine! Gava merov ji we re qala Parîs yan jî Roma dike, ji kêfa devê we diçe pişta sikura we. Lê gava qala Amed'ê tê kirin, ji qehra hûn vedireşin. Zu ji ber çavên min hunda bib!**

Yilmaz di nîvê film de dîsa bi jinekî din re qise dike, jin jê dipirse:

*- Tu ji çi bajarî yî?*

**- Ez ji Wan'ê me.**

*- Ma behra Wan'ê mezin e yan na?*

**- Belê pir mezin e. <u>Niha jî pirekî li ser ava dikin. Ji Wan'ê heta Serhedan...</u>**

Weke tê dîtin Yilmaz, bi çend gotinê xwe, nexşeya xaka niştiman, beşê ku ji teref rejîma Tirkiyê hatiye dagîrkirin aniye zimên.

Ber bi dawiya film de dîsa jinek bi Yilmaz re qise dike:

*- Ez bi eslê xwe îtalyan im.*

**- Ez jî îtalyan im.**

*- Îtalya!*

**- Belê, ez îtalyanek xur im. Navê bavê min Hemîd e. Ew li qeza Girê Sor (Sîwerek) pir tê nasîn.**

*- Girê sor! Girê sor li çi alî dimîne?!*

**- Girê Sor qezayek herî mezin e ku bi ser Roma ve ye. Di her taxek bajêr de, 50 kebabxane heye. Xwarina bavê min pir bi taam e. Merov dikare tiliyên xwe jî pêre bixwe.**

Weke tê dîtin Yilmaz ji serî ve, welatê ku jê hatiye qet jibîr ne kiriye. Welatê xwe li ser gelek welatan digirt.

**Hesp, jin û çek**

Yilmaz di film de serekleystikvan, senarîst û birêvebiriyê dike. Film di sala 1966'an de hatiye kişandin.

Jineke mêranî, hespek baş û çekek bi qelîte, di kultura Kurdan de xwedî cihek taybetî ye. Yilmaz di film de, xwedî çek û hespek baş e. Lê hevala wî tuneye. Biryar dide ku jineke mêranî bibîne da ku pêre jiyana xwe bidomîne...

**Qanuna çekan**

Film di sala 1966'an de hatiye kişandin. Yilmaz di film de serekleystikvan e. Filmek polîsî ye û serguzarî ye.

**Qralê krêt**

Pilmek polîsî ye û serguzarî ye. Di sala 1966'an de hatiye kişandin û Yilmaz tê de serekleystikvan e. Piştî vî filmî, li gelek deveran Yilmaz bi navê "Qralê krêt" hate nasîn.

**Eşrefpaşayî**

Yilmaz senaryoya film bi xwe nivîsandiye, tê de serekleyistikvan e û film di sala 1966'an de hatiye

Institut kurde de Paris



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE

kişandin. Têkoşîna kesekî li hember merovekî maldar, tîne zimên.

Kudret (Y) di taxa xwe de kesek bê tirs e. Kesekî maldar dixwaze tara wan xira bike û febrîqeya bi alîkariya Emerîka li wir ava bike. Kudret li dij derdikeve û xelkê bi rêkxistin dike. Lê du bendiya ku bi destê yê maldar tê derxistin, daxwaziya Kudret nabe serî...

**Mêrê çê brîndar e**

Film di sala 1966'an de hatiye kişandin û Yilmaz di film de serekleystikvan e. Ji awira hunerî ve Yilmaz mîna karkerekî dileyize û bi rola xwe baş radibe, konsantrasyoneke mezin pêre ye.

Naveroka film li ser neheqiyên ku li karkeran tê kirin û rîpên maldaran e.

**Alîyê kowboy**

Film di sala 1966'an de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e.

Di wan salan de filmên kowboy li Tirkiyê pir aktuel bûn. Yilmaz jî li gorî demê di film de leyistiye.

Naveroka film, li ser kesekî ku di bin hikariye filmên kowboy de maye ye. Ew kes li hevalên xweyî hepsê digere. Pêrgî hevalekî xwe dibe, paşê bi derewan dibe lawê malbatekî ku lawê wan berî niha hunda bibû. Dawî lawê wan tê, lê kesekî pir xirab e.

Şerê kesê kowboy û lawê wê malê dest pê dike.

**Zagonên li ser sînoran**

Yilmaz çîroka film bi xwe nivisandiye û serekleysikvan e. Film di sala 1966'an de hatiye kişandin. Di festîwala Antalya xelat girtiye û bûye cihê serbilindiyê.

Naveroka film li ser sînoran e ku leşkerên Tirk nobetê li ber digrin û ji aliyê din xelk ji naçarî derbasî aliyê din dibe. Yılmaz bi xwe jî diçe û tê. Ji aliyê din li ser

lîstokê axayê gund disekine û têde tîbûna gelê Kurd ji bo xwendinê tîne ziman.

Yilmaz bi vî filmî gelek şopên Kurdewarî daye nîşandan; ji jiyana sosyal heta ya çînayetî, ji tore û adetan heta jiyana kulturî... Ji awira leystikvaniyê ve jî, Yilmaz di film de pir bi serkevtî ye.

**Bomba Kemal**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e. Naveroka film li ser pêxwasên mêr in ku ji meyxanan xeracê werdigrin.

Pêxwasê herî xurt Kemal dev ji dosta xwe berdide, lê jin bi halekî ye. Jin diçe bi yekî din re dizewice, lê ew û mêrê xwe buye hedefa kesên xirab. Dawî Kemal li hember wan xeraban şer dike.

**Celadê rêbiran**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin û Yilmaz di film de serekleystikvan e.

Naveroka film li ser şerê di navbeyna axa û gundiyan de ye.

**Ber di min ve naçin**

Yilmaz senaryoya film nivîsandiye û birêvebiriya film kiriye û her wiha di film de serekleystikvan e. Film di sala 1967'an de hatiye kişandin.

Yilmaz û yekî din dişibe hev. Ji bo vê jî serê wî dikeve belê û şer di navbeyna Yilmaz û wan kesan de dest pê dike.

**Navê min Kerîm e**

Filmek polîsî ye. Kerîm (Y) polîs e û bi dizî dikeve nava hêzên reş. Dawî pê dihisin ku di nav wan de polisek heye. Ji Kerîm dikevin şikê, lê ew xwe nade dest. Di



Institut kurde de Paris

dawiya film de Kerîm, vê hêza reş hildiweşîne.

Yilmaz serekleystikvan e, Senarîst û birêvebiriya film kiriye. Film di sala 1967'an de hatiye kişandin.

**Celadên mezin**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin. Yilmaz tê de serekleystikvan e.

Naveroka film li ser grupek kese ku kesên xirab hildibijêrin û dikujin e. Paşê nakokî di nava grupê bi xwe dertê û şer dest pê dike.

**Dizê hespa Banuş**

Çîrok li ser dizê mêr Banuş e ku hespa didize, difroşê û perê wan li bêkesan belav dike, zikê birçiyan têr dike. Dawî axa ji Banuş dixwaze ku qîza axayekî din, jêre birevîne. Banuş vê qebul dike, lê ji ber ku dibe mîna qewadiyê, poşman dibe û qîzê dibe mala bavê wê. Dawî banuş dil dikeve qîzê. Ji aliyê din ve şer di navbeyna Banuş û axa derdikeve.

Yilmaz di film de serekleysikvan e û çîroka film wî bi xwe nivîsandiye. Film di sala 1967'an de hatiye kişandin.

Ji diziya bi mêranî hetanî nakokiyên di nava axa û kesên hejar, tev di film de xuyanî dike. Film jiber jiyana Kurdan hatiye wergirtin.

**Neviyê şeytên**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e û her weha çîroka film ji teref wî hatiye nivîsîn.

Yilmaz xwedî grubeke ku gelek deveran bi zorê dişelînin. Di dawiya film de Yilmaz û polîs dikevin hemberî hev. Yilmaz zora tevan dibe lê polîsê dawî lawê Yilmaz e û Yilmaz bi destê lawê xwe tê kuştin.

Di film de gelek mesajên rind hene ku Yilmaz ji awi-

Institut kurde de Paris

ra zindaniya ji me re hiştine.

Baba Kazım (Y) gava nû dikeve hepsê kesek tê pêşiya wî,

**Baba Kazım: Vaye em dîsa hatine cem hev hoste Tahır...**

*Tahır: Qismet... Ez bawer im ku li zindanê hîna nan û xwêya ku em bi hev re bixwin heye.*

**B. Kazım: Nan û xwêya ku li zindana tê xwarin nayê ti wateyê...**

Li devereke din dîsa kesek din jê dipirse:

*P. Kemal: Bibhure.. Lê dixwazim tiştekî ji te pirsiyar bikim?*

**B. Kazım: Belê...fermo ez guhdariya te dikim.**

*Kemal: Tu, li ser serpêhatiya min agehdarî... Dê cezeyê min pir giran be, belku jî min bi darvekin. Min ti rê nedît. Ma tu dikarî aqilekî bide min?*

**B. Kazım: Mirove mahkum aqilê xwe, cara yekem ji xwe re bi kar tîne...**

*Kemal: Wiha nebêje...tu xwedî tecrubeyî...bi awayekî vekirî ku dixwazim ji te re bêjim, ez dixwazim ji hepsê bazbidim.*

**B. Kazım: Tê wê wateyê ku tu çend berê nobedaran bide ber çavê xwe, jê pê de tu tehlukê din namîne...**

Li devere din jî li ser dilovaniya xwe, têkoşîna xwe disekine:

**B. Kazım: Heya niha çi hatiye serê min û ez li hember qanûna tême dadgehkirin, ji ber wê ye ku ez merovek dilovan im.**

**Qralê krêt efû nake**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin. Senaryoya film ji teref û wî û kesek din hatiye nivîsîn, Yilmaz serekleystikvan e.

Yusuf Dağcı (Y) mecbure ku dijminê xweyî xwînê bi destê xwe biparêze. Ew dijminê xwe ji hepsê rizgar dike,

lê di dawiyê de li gorî biryar daye, gere dijminê xwe bikuje. Lê ew dil ketiye xwîşka dijminê xwe û dawiya film bi xweşiyê tewaw dibe.

Yilmaz (Yusuf Dağcı) di çend deverên film de, li serjiyanê mesajêk delal gihandiye me.

*Ayşe: Di nava mirovan de, tim şer heye. Merov dikare bêyî pevçun, pirsên xwe bi riya qisekirinê çareser bike. Ev pevçun ji bo çi ye?*

*Di van çend salên jiyana xwe de her pevçun û lêdan û mirin...*

**Y. Dağcı: Pevçun, kîn û mirin, di jiyana me de qanunên bê guhertin in. Merovantî nikare ji van xwe biparêze.**

**Recep'ê har**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin. Yilmaz sereklevstikvan e.

**Cumalî'yê bejin zirav**

Film ji ber destanekê Çîn'î hatiye girtin û di sala 1967'an de hatiye kişandin. Di film festîwala Antalya ya sala 1968'an, xelata herî baş girtiye. Yilmaz serekleystikvan e.

Naveroka film li ser dijminantiya di navbera du axa de ye ku yek ji wan tê kuştin û ji mala wî, lawê wî xilas dibe, ji teref kesek din tê xwedîkirin. Cumalî (Y) mezin dibe û dil dikeve qîza dijminê xwe û wê direvîne. Pê dihisin, lê buyer mazin nabe. Bavê qîzê ji teref biraziyê axa tê kuştin û dikeve skura Cumalî. Hikumet li Cumalî digere û şer di navbeyna Cumalî û katilan de dest pê dike...

**Kızılırmak**

Yilmaz di film de serekleystikvan e, naveroka film ji ber destana Nazim Hikmet "*iki Anadolu*" hatiye wergir-



Institut kurde de Paris

tin û di sala 1967'an de hatiye kişandin.

Kesek şivan dil dikeve qîza axa. Dawî şertekî datînin berê. Kesê şivan şertê wan bi cîh tîne lê, lê diqulipin û şer di navbera wan de dest pê dike.

**Arifê ji Balatê**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin û Yilmaz tê de serekleystikvan e. Filmek li ser eviniya xortekî xwendevan e.

**Qatilê ku dê bibe qurban**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin û Yilmaz tê de serekleystikvan e. Naveroka film li ser yekî araqvexur e.

Hinek wî xwedî dikin da ku hineka din bikuje. Lê ji ber evîniyê, di dawiyê de vî karî qebul nake û şer dest pê dike.

**Kozanoxlî**

Film di sala 1967'an de hatiye kişandin û Yilmaz têde serekleystikvan e.

Kozanoğlu, li hember neheqan li serê çiyan şer dike. Osmanlî, efuya wî derdixin û ew dibe memur, lê duvre bêbextiyê lê dikin û dixwazin wî bidarvekin, lê gel radibe ser nigan...

**Ez im Ezraîl**

Film di sala 1968'an de hatiye kişandin û Yilmaz di film de serekleystikvan e, senaryoya film ji teref wî hatiye nivîsîn.

Örfiyê Mezin (Y) bê tirs e. Xwîşka xwe ji biçukayî dide malbateke dewlemend. Xwîşka wî bi polîsekî re dizewice, lê birayê xweyî belekir Örfî nanase.

Di navbera Örfî û kesên dinî belekir şer dest pê dike. Örfî gelekan ji wan dikuje, ew jî sax namîne.

Xwîşka wî gava pê dihise ku Örfî birayê wê ye, bi der-

Institut kurde de Paris

engî dikeve...

**Hutê Beyoxlu**

Film di sala 1968'an de hatiye kişandin û Yilmaz têde serekleystikvan e.

Ev film jî, li ser quremêrî û belekiriyê ye, şerê di nava wan de tîne zimên...

**Marmara Hasan**

Film di sala 1968'an hatiye kişandin û Yilmaz tê de serekleystikvan e. Naveroka film li ser şerê di navbeyna pêxwasan de ye.

**Bazara (cihê) kuştinê**

Film di sala 1968'an de hatiye kişandin û Yilmaz têde serekleystikvan e.

Film li ser pirsa xwîniyê ye. Îlyas (Y) ji bo ku dijminê xwe bikujê tê bajêr. Piştî demekê wî nabîne û dil dikeve qîzekî. Lê dijminê wiyî li bajêr vê carê dev jê bernadê...

**Kuştin mafê min e**

Film di sala 1968'an de hatiye kişandin û Yilmaz têde serekleystikvan e.

Filmek li ser xwîniyê ye ku qîzek û xortek ji herdu aliyanin lê nikarin bi hevre bizewicin. Piştî şer, herdu malbat nerm dibin û îcaza wan didin ji bo ku bizewicin.

**Seyidvan ê qijak an Xelîl**

Filmek li ser xwîniyê ye. Yilmaz senaryoya film nivîsandiye û têde serekleystikvan e. Film di sala 1968'an de hatiye kişandin. Yilmaz di gelek filmên xwe de pirsa xwîniyê ji pir awiran ve aniye zimên. Carna senaryo ji teref wî hatiye nivîsîn û carna jî di senaryoyê amadekirî de leyistiye.

Xelîl (Y) ji ber hin sedeman nikare qatilê bavê xwe bi-

Institut kurde de Paris

kujê. Birayê wî tê û alîkariyê ji Xelîl dixwaze. Lê ji ber ku kesê birayê Xelîl, li ber destê dayika wî mezin bûye û ne birayê Xelîl e, lê lawê yê qatil e, Xelîl pêre naçe. Dawî birayê Xelîl bi rewşê dihise û Xelîl dest bi şerê xwe dike..

**Nûri'yê mîna kêçê**

Yilmaz birêvebiriya film kiriye, senaryoya wê nivîsandiye û tê de serekleystikvan e. Film di sala 1968'an de hatiye kişandin. Li ser pevçunên nav pêxwasan disekine ku meyxana dişelînin.

**Seyidxan**

Seyidxan ji awira sosyal, evîniyê weke Kurdekî hatiye fikirkirin û kişandin. Roja ku derket ber temaşevanan, mezinbûna Yilmaz ji teref hemû kesî hate qebûlkirin. Film, xelatên pir alî wergirtine.

Seyidxan (Y) bi heft dila dil dikeve kejê. Kejê jî wiha ye:

*Kejê: Ez çiqilek ji dara şîn im Seyidê min, ger ez hişk nebim dê tim li benda te bim.*

Lê Seyidxan ji ber ku xwedî xwînî ye, malbata Kejê pê dil ne xweş in. Jê dixwazin ku dijminên xwe ji holê rake û were, paşê dikare bi Kejê re bizewice. Seyid tevan dikuje û tê. Lê gundî wa dizanin ku Seyid têk çuye. Paşê nîşanekî datînin ku bi tivinga xwe berdine de. Kî lêde dê bi ser bikeve. Seyid berdide selikê.

Diçe dinere ku Kejê di bin selikê de ye. Kejê bi destê wî hatiye kuştin. Seyid bi xezeb radibe û kesekî wan sax nahêle...Film di sala 1968'an de hatiye kişandin. Yilmaz birêveriya film kiriye, senaryoya wê nivîsandiye û têde serekleystikvan e.

**Gurên birçî**

Yilmaz serekleysikvan, senarîst û û birêvebir e. Film di sala 1969'an de hatiye kişandin.



Institut kurde de Paris

Piştî ku rêbir pîreka Mihemed(Y) direvînin û dihavêjin nêzî gund. Mihemed jî, ji bo ku şerê ne qencê rêbiran bike, derdikeve serê çiyê û dest bi şer dike. Di dawiyê de ew û hêzên dewletên têne hemberî hev.

Film ji ber buyerekê ku li bajarê Sêrt'ê buye hatiye girtin .

**Guney mirinê belav dike**

Film di sala 1969'an de hatiye kişandin û Yilmaz serekleystikvan e. Filmek serguzarî ye ku piştî naskirina jinekî, tiştê tê serê belekirekî tîne zimên...

**Qanuna ber'an**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1969'an de hatiye kişandin. Li ser pêxwasên meyxana û evîniyê disekine.

**Dê xwîn mîna avê birje**

Yilmaz serekleystikvan e û film ji ber filmê Ö. Akad *"Katil"* hatiye girtin. Di sala 1969'an de hatiye kişandin.

**Belayên heft cure**

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn û ew serekleystikvan e. Film di sala 1969'an de hatiye kişandin.

Yilmaz di film de li ser xweşî û nexweşiyên jiyanê mesajên delal hiştine. Film bi xwe jî, ji çîrokek rastî hatiye girtin ku qehremanê vê çîrokê Zaza Şêxmus e. Film li ser malbatek Kurd e ku bav û lawek polîs in û yê din jî bi karê belekiriyê dadikeve. Dawî bav tê kuştin, law tê heyfa wî.

Yilmaz di gelek filmên xweyî seretayî de mesajên bi nirx ji me re hiştine. Ji ber ku filmên wiyî dawî, bi tevayî mesaj in, derd û kesera gel tîne zimên, me pêwîstî nedît ku qala mesajên di nava filmên wiyî nuh bikin. Lê ji bo bête zanîn ku Yilmaz, ji serî ve welatê xwe jibîr nekiriye

û welathez e, emê mesajên wiyî destpêkê bidin xuyanîkirin.

Jinek ku çek'ek di dest de ye, ji Yilmaz pirs dike:

- *Niha tu ji min natirsî ku te bi vê çekê bikujim?*

**- Em bi berê qencan namirin. Ku kuştina me bibe, dê bi çekên xiraban be.**

Li devereke din, dîsa jin jê tika dike:

- *Bihêle, dev ji wan berde, bila qanûn bi wan dakeve, ceze bike!*

**- Nuha qanun ez im. Ger mirovantî bixwaze jiyaneke bi namus û xweşî bidomîne û jiyaneke wiha ava bike, pêwîst e fêrî hesap xwestinê bibe. Gava mirov zindanê, nefîkirinê û kuştinê nede ber çavên xwe, mafê jiyanê nikare bi dest xîne...**

Li devereke din, dîsa muneqese di navbeyna wî û jinekî derdikeve, jin jê re dibêje:

- *Tu meroveki dirunde yî!*

**- Ez miroveki dirundemim. Ger mecal bi dest min biketa, dê minê li ser erdê mirovên ne baş tev bikuştina. Lê ji bo bi cîh anîna vê daxwaziya min, ne jiyan û ne hêza minî heyî têr nake.**

**Bi hezar an car dimrim**

Film di sala 1969'an de hatiye kişandin. Yilmaz senaryoya film nivîsandiye û serekleystikvan e. Mixabine ku me film bi dest ne xist. Çîroka film bi kinahî wiha ye.

Bav xwedî dijmin e. Jina wî hemîle ye. Dijmin digrin ser wan, bav hineka ji wan dikuje. Jina wî di ber halê xwe de dimre. Biryar dide ku zarowên xwe deyne ber deriyê dewlemendan. Herdu zarokên xwe datîne ber deriyê du kesan û dikeve hepsê. Yek ji lawê wî dibe polîs û yê din deveran dişelîne, belekir e. Dawî herdu bira dikevin hemberî hev...

**Belekirê bi du demaçe**

Yilmaz tê de serekleystikvan e. Film di sala 1969'an de hatiye kişandin. Ji ber nivîsa M. Aslan *"siyah şapkalı adam"* hatiye girtin.

Li ser kar û xebata rojnamevanekî dilpak disekine ku serê wî dikeve belayê û birayê wî tê pêve...

**Merovek krêt**

Li festîwala Antalya di sala 1970'î de, xelatên cure cure wergirtine. Film di sala 1969'an de hatiye kişandin. Yilmaz senaryoya wê nivîsandiye, birêvebiriya filmî kiriye û serekleystikvan e. Çîroka wê li ser kesekî ye ku bi pera mirovan dikuje û gelek bi tehluke ye. Rojekî hêzek bavê wî bi destê wî dide kuştin, lê ew nizane ku bavê wî ye. Paşê ew û qîza zilamekî ku bi destê wî hatiye kuştin, dil dikevin hev. Lê wan rehet nahelin. Bîno (Y) dest bi kuştina wan dike.

Yilmaz jiyana mêrkujan ji awira sosyal û psîkolîk ve baş anîye zimên. Kesê ku ji bo pera mêran dikuje, cîhê wanî di ciwatê de derdixîne holê.

**Bila xwedê wî efû bike**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin, Yilmaz têde serekleystikvan e. Şerê di navbera kesên qaçaxiyê dikin û kesekî din de ye ku dixwaze ji wan veqete.

**Osmanê peyahî**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin. Yilmaz birêvebiriya film kiriye û senaryoya wê nivîsandiye û têde serekleystikvan e.

Osman (Y) wênegir e û dosta wî rojnamevan e. Serê dosta wî bi grupeke binerd ku reş kar dikin re dikeve belayê. Osman jî alîkariya dosta xwe dike...

Di serê film de pir dîmenên bi nirx têne nîşandan ku sloganên şoreşgerî ne. Di nava film de jî Osman ji bedêla dosta xwe diçe nav karkeran ku berxwe didin. Li wir

karker, gelek peyvên xweş li ser têkoşîna xwe dibêjin. Ji awira din jî, polis dev ji Osman bernadin û her bi duv wî de ne.

**Heya dilopa xwîna minî dawiyê**

Yilmaz di film de serekleystikvan e. Film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Qîzek naxwaze bi axayê gund re bizewice û bazdide çiyê. Li wir pêrgî mahkumekî dibe. Evînî dest pê dike, lê divê kesê mahkum şahidekî bibîne ji bo ku xwe ji devê dewletê xilas bike...

**Îmza min bi xwînê tê avêtin**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin. Yilmaz senaryoya film nivîsandiye û serekleystikvan e. Me ev film bi dest ne xist.

Yilmaz mahkum e. Ji bo ku cezeyê xweyî dawî liderve bikşîne tê Kayseri. Li wir dil dikeve yekî. Lê hevalên wî yê kevn tên û dawê lê dikin ku bi wan re, di karê berê de bişixule. Ew vê yekê napejirîne.

Hevalên wî qîzê direvînin û di navbeyna wan de şer dest pê dike.

**Hêvî**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin. Yilmaz birêvebir, senarîst û serekleystikvan e. Ji ber ku filmek bi nirx bû, gava hate nîşandan, li Fransa, li film festîwala Adana û hwd. pir alî xelat wergirtine.

Jiyana Cabbarê xwedî fayton, wekî jiyana gelek kesan bi jarî derbas dibe. Hespa wî dimre. Nikare merovan jî bişelîne û hêviya wî maye meleyê ku berbejna çêdike, ji bo ku xezineyekê derxînin. Ew û mele û hevalê xwe, ji bo derxistina xezînê diçin çiyan.

Cabbar (Y) perenin bi sînor li mal daniye. Demekê dikolin, lê tu xezîne xuya nake, dawiyê aqlê xwe berdide.

Institut kurde de Paris

Ji gelek awiran ji ber jiyana Kurdan hatiye girtin.

**Mêrê bê tirs**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e.

Birayê Yilmaz di karê reş de, di ferîbotekî de kar dike. Ew ji teref şixulkêrên ferîbotê tê kuştin. Dawî Yilmaz dikeve duv wan...

**Heft kesên belekir**

Yilmaz birêvebir û serekleysikvan e. Senaryoya film ji teref wî hatiye nivîsîn. Film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Heft kesên xwenda ku mahkumê dewletê ne jiyana xweyî mayî li çiyan li hemberî neheqan derbas dikin. Vê carê ji bo xelasbûna kesekî ji hepsê, şahidê buyera wî dibin heya bajêr. Ji aliyê din ve serê qîzekî bi grupekî din re ketiye belayê. Ev heft kes, qîzê jî dixin nava grupa xwe. Herdu grupê mezin ku di duv qîz û şahid de ne, dikevin duv wan û şerê mezin di nav wan de dest pê dike.

Yilmaz di gelek filmên xwe de mahkumê dewletê ye, lê li aliyê din, li hember neheqan e. Bi awayekî din, sîstema dewletê li hember neheqiyê nabîne, ew bi mesajên xwe, carna jî bi qeweta xwe alternatîfan çêdike. Alternatîfên wî bi giranî, şerê polîtîk û çekdarî ye. Ew di gelek filmên xwe de berxwe dide, teslîmî dewletê nabe û mirinê çêtir dibîne.

**Hedefa bi can**

Yilmaz senarîst, birêvebir û serekleystikvan e. Film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Asim (Y) ji ber ku di dema xwe de gelek kes êşandine, niha jî bi hatina wînî bajêr nexweşî dest pê dike. Hemu

Institut kurde de Paris

kesên ku hez jê nakin lê digerin û qîza wî direvînin, tecawizî wê dikin. Dawî di navbeyna wan û Asim de şer mezin dibe.

**Tehtên Şeytên**

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn û ew serekleystikvan e. Film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Filmek evînî ye ku Yilmaz piştî bav û birayê qîzê bi kêleka xwe ji firtona bahrê rizgar dike û piştî tengasiyê dil dikeve qîzê, ji aliyê dinî sînor. Lê qanun û tore, tev li dij vê evîniyê ne. Lê Yilmaz û qîz hevudin direvînin û li reşahiyeka nîvê bahrê de bi cîh dibin. Herdu aliyê sînor pev niçin, di dawiyê de firtone li evîndara radibe...

Evîniyên li ser sînoran û pirsên li wir baş tîne zimên. Weke kesek ku li hember xeletiyan şer dike derdikeve pêş û herdu evîndar dibin kurbana dîtînên fermî û toran...

**Merovê dawî yê hêrsdar**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Naveroka film li ser kesekî ye ku deveran dişelîne û di dawiyê de dike ku bê girtin, lê bazdide. Li devera ku bazdide, dizewice û lawek wî çêdibe. Di dawiyê de Yilmaz bi malbatî tê bajêr, lê vê carê grupa wiyî kevn dikeve duv wan û şer di navbeyna wan û Yilmaz de dest pê dike.

**Zeyno**

Yilmaz serekleystikvan e û film di sala 1970'î de hatiye kişandin.

Murat (Y) diçe bajêr da ku heyfê hilîne. Lê li bajêr dil dikeve qîza dijminê xwe. Dawî vedigere gund. Lê qîz jî tê wir. Dawî diçe qîza dijminê xwe, jê dixwaze, lê nadinê. Di dawiya film hevudin direvînin, lê herdu jî tên

kuştin...

**Parêzgerê minî bi rêz**

Film di sala 1970'î de hatiye kişandin, Yilmaz senaryoya film nivîsandiye û tê de serekleystikvan e.

Sîlwan Memet belekirek bi navdar e. Kesekî din heye ku sê qîzê wî hene, lê di jiyaneke sersar de dijîn. Bavê wan alîkariyê ji Sîlwan Memet dixwaze da ku qîzê xwe bi terbiye bike. Sîlwan Memet bavê wan dişîne devereke din û wan ji jiyana xirab diparêze, fêrî jiyaneke bi rêk û pêk dike. Di dawiya film de yek ji qîzan dil dikeve Memet, lê ji ber ku Memet bi jin û zarok e, daxwaziya wê naçe serî...

Jiyana ku fêrî qîza dike û nêzîkbûna Memet li qîza, weke kesekî Kurd e. Ji xwe çîrok jî, ji ber jiyana kurdekî hatiye wergirtin...

**Krêt û wêrek**

Film di sala 1971'î de hatiye kişandin û senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn. Yilmaz serekleystikvan e.

Kesê xerîb (Y) tê gundekî ku gund ji ber zilma "Lawê Rojê" dinale. Dawî gundiyan bi rêkxistîn dike û berxwe didin. Gundî serî radidin û zora wan dibin.

Di film de mesajên pir alî ji awira berxwedanvanî, rêkxistinî hene.

Kesê xerîb ji gundiyan re dibêje:

**Kesê xerîb: Hûn dixwazin ji zilma Lawê Rojê rizgar bibin, hûn dixwazin şer bikin?**

*Gundî: Em dixwazin...*

**Kesê xerîb: Nexwe du rê li pêşiya we heye, yan mirinekî bi namus yan jî jiyaneke bê şeref.**

*Gundî: Ma ji bilî mirinê pêve dê çi bibe?*

**Kesê xerîb: Ev 20 sale ku ez bi zalim û bênamusan re şer dikim. Ev 20 sale ku çeka min li hember neheqiyê di-**

Institut kurde de Paris

**teqe. Min rastiyek dît ku şerê bi pîsan re zehmetiyên xwe hene. Lê gere hêza dijmin mirov netirsîne. Ji ber ku ev şerê ku dê hûnê bidin, ji bo şerefa we ye. Ji bo jiyaneke xweş, mirovantî dikare gelek tiştan bike. Ji bo ku mirov jiyaneke xweş bi dest xîne, divê mirov mirinê jî bide ber çavên xwe.**

*Jinika bî: Gelo emê karîbin heyfa mêrê min û kesê ku bi destên wan hatine kuştin, hilînin?*

**Kesê xerîb: Devera ku zilm û zordarî lê çêdibe, berê xwe dide merovên diyar. Min ji xwe re kiriye prensîp ku bi zilmdaran re şer bikim. Ji bo ku ez vî şerî bidomînim jî, pêwîstî tuneye ku ez wan kesên tên perçiqandin binasim.**

*Jinika bî: Belku ti sibê bête kuştin. Kûştina te dê me jî xemgîn bike.*

**Kesê xerîb: Mirin çi demekê tê bila were. Mirina bi mêranî ji min re şerefe. Mirin, bila me di nava nivîna de negre, bes e.**

*Jinika bî: Emê di vî şerî de biserbikevin yan na?*

**Kesê xerîb: Di nava têkoşînê de gava mirov têk here jî ev, ew mîna têkçunê naye jimartin.**

**Mezinantiya ku li ser zilmê ava bûbe mehkumê ketinê ye û tu zilm û zordarî jî bê ceze namîne...**

**Îbret**

Film di sala 1971'î de hatiye kişandin. Yilmaz serekleystikvan e, senaryoya wê nivîsandiye û birêvebiriya wê kiriye.

Doktor (Y) ji hepsê bazdaye û tê cem hineka din ku binerd dişixulin. Serokê wê grubê ji hepsê derketiye û qîza polîsê ku ew xistiye hepsê direvîne. Qîzê teslîmî doktor dikin, lê doktor dotsê polîs e. Di dawiyê de doktor dikeve duv grupê û gelekan dikuje...

Institut kurde de Paris



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**Namus û silah (çek)**

Yilmaz serekleystikvan e. Film di sala 1971'î de hatiye kişandin. Îlyas (Y) hez ji qîzekî dike. Rojekî qîz ji teref çend kesên tewtewe tê ravandin û paşê qîz, li ber çavê Îlyas reş dibe. Îlyas ji nuh ve dest bi karên reş dike. Hezkiriya wî bi hemîle ye, piştî welidandinê bi demekê, bi yekî din re dizewice. Îlyas tê girtin. Piştî ku ji hepsê derdikeve, dinere ku grupa reş dixwaze mêrê hezkiriya wiyî kevn bikuje. Îlyas naxwaze ku zaroka wî bimre û di navbeyna wan de şer dest pê dike...

**Merovên kaçax**

Yilmaz di film de birêvebir, senarîst û serekleystikvan e. Film di sala 1971'î de hatiye kişandin.

Osman merovek ji kesê nas e ku bê tirs e û dev ji karê belekiriyê berda ye. Lê li cem kesekî din belekir û dolemend kar dike. Kesê din pir bi kumarê dileyize û zora hevalekî xweyî kevn dibe. Lê perê wî tineye. Ji bedêla pera, qîza wî dixwaze. Ji ber ku qîza mêrik xort e û kesê bi serketî pîr e, napejirine. Di dawiyê de Osman qîzê direvîne, lê Osman vê yekê napejirine û qîzê dişîne mal. Vê carê qîz ji teref kesê xwediyê deyn tê revandin û ew, derbasî irzê qîzê dibe. Osman, dest bi kuştina wan dike...

**Sibe roja dawîn e**

Yilmaz senaryoya film nivisandiye, serekleystikvan e û birêvebiriye film kiriye. Di sala 1971'î de hatiye kişandin.

Reşo û Şînê gelekî hez ji hevudin dikin. Herdu jî belekir in. Tobedarê karê xirab in, lê grupên din dev ji wan bernadin. Zorê didine wan û dîsa tevlu bela dibin. Gelekî ji wan dikujin. Bazdidin û li ser riya xwe kesekî dewlemend rehîn digrin. Piştre, ji ber sedema bi hemilbûna Şînê, dubendî dikeve nav wê û Reşo. Şînê teslîmî polîs dibe, lê Reşo bi destê polîs tête kuştin...

Institut kurde de Paris

Di dema rehîngirtina kesê dewlemed de, di navbeyna xwe de musabeqeyek zanînê çêdikin. Yilmaz li vir maldarên Tirk ji çend aliyan derdixîne holê ku: hayê wan ji rewşa hejaran, ji Kurdistanê (pirsa qeza Midyadê jê dike) tune ye û du bendî di nava mala wan bi xwe de heye.

Di nava film de nerazîbûna Yilmaz li hember dewletê jî derdikeve pêş... Film di festîwala Adana'de, di sala 1971'î de xelat wergirtiye.

**Jan**

Yilmaz senaryoya film Yilmaz nivîsandiye, birêvebiriya film kiriye û tê de serekleystikvan e... Film di sala 1971'î de hatiye kişandin.

Film xelat wergirtine. Çîçek Alî (Y) tê cem dijmina xwe û efuya xwe dixwaze. Piştî ku li hevdu tên, tifaqa wan xurt dibe. Hinek ji gundiyan dest bi xirabiyê dikin lê bi ser nakevin. Dawî dikevin pêşya wan, yek tê kuştin û Çîçek Alî kor dibe. Bi çavê kor xwe fêrî bikaranîna çekan dike. Di dawiya film de yek bi yek, wan gundiyên xirab dikuje...

Film di festîwala Adana ya 3'an de (1971) xelatên cure cure girtine.

**Şînî**

Xelatên pir alî wergirtine. Film di sala 1971'î de hatiye kişandin. Yilmaz birêvebiriya film kiriye, serekleystikvan e û senaryoya film nivisandiye.

Çobanoxlu xwedî grupek kes e û li ser sînoran kar dikin. Karê kesekî dewlemed digrin, lê qeleşî lê dikin. Çobanoxlu brîndar dibe, dawî rihet dibe û kesên ixbarvan dikujin. Di dawiya film de bi cenderman re şer dikin û tev tên kuştin...

Çîroka film ji Kurdistan hatiye girtin. Film, li welat û derveyî welat xelatên pir alî girt. Yilmaz bi vî filmî, mirovê herî hunermend yê sala 1972'an hate pejirandin.

Institut kurde de Paris

**Talankêr**

Cesî (Y) û Kont hevalê hevin. Li talanê xelkê dixin. Hinek grubên din mîna wan henin. Şerê di navbera wan de bilind dibe. Polis tevlu vî şerî dibe...

Film di sala 1971'î de hatiye kişandin, Yilmaz senaryoya wê nivîsandiye, serekleystikvan e û birêvebiriya film kiriye...

**Kesên bê hêvî**

Film di sala 1971'de hatiye kişandin. Yilmaz birêvebiriya film kiriye û senaryoya wê nivîsandiye û têde serkeleystikvan e. Me film bi dest ne xist...

**Baba**

Film ji ber çîroka Bekir Yildiz "*Üç yoldaş*" hatiye girtin. Di sala 1971'de hatiye kişandin. Yilmaz birêvebiriya film kiriye û serekleystikvan e.

Malbatek feqîr li di mala kesekî dewlemend kar dikin. Lawê kesê dewlemend kesekî dikuje. Malbata feqîr vî sucî hildigrin ser milê xwe. Lê Malbata dewlemend sozê ku dane nayîne cî...

Film ji awira hunermendî, di sala 1972'an de li film festîwala Adana, xelatên cure cure girtine.

**Sextekar**

Yilmaz serekleystikvan e. Di sala 1972'de hatiye kişandin.

Akif (Y) dibe mamostekî sexte da ku dibistanê bişelînin. Hevalê wî hemu tiştî amade dikin, lê di roja dawî de ji ber ku gelekî hez ji zarokan dike, vê sextekariyê napejirine û tê kuştin...

**Kesên belengaz**

Film di sala 1974'an de hatiye kişandin. senaryoya film û birêvebiriya wê ji teref Yilmaz û alîkariya kesekî

din hatiye amadekirin. Yilmaz serekleystikvan e. Film gelek xelat wergirtine.

Abuzer, kesekî hejar e ku gelek caran ketiye hepsê û jiyaneke nexweş buhirandiye. Piştî ji hepsê derdikeve, ew jiyana wiyî nexweş, li derve jî berdewam e...

Di festîwala Antalya ya 12'an de xelat wergirtiye û her wiha xelat ji hin komelên hunerî jî wergirtiye...

**Heval**

Azem (Y) û Cemîl hevalê hev in. Cemîl dewlemend bûye, ketiye jiyeneke tevlu hev û bê exlaq. Azem dixwaze wî ji vê jiyanê rizgar bike. Gelekî kar dike lê bi ser nakeve...

Film gava derket rekor şikand. Senaryoya wê ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn, birêvebiriya film kiriye û tê de serekleystikvan e. Di sala 1974'an de hatiye kişandin.

Ev film, nirxandinek taybetî dixwaze.

Film di film festîwala Antalya ya sala 1975'an de xelatên cure cure wergirtine. Di navbeyna salên 1970-80'î de li Tirkiyê di nava filmên herî bi nirx de, bu filmê sêwem.

**Dil ne rehetî**

Di dema kişandina film de endamê dadgeha bajarê Yumurtalık hate kuştin û qetla wî xistin skura Yilmaz. Ji ber vê film ma di nêvî de ma û duv re ji teref kesekî din hate îdarekirin. Yilmaz senaryoya film nivîsandiye film di sala 1974'an de hatiye kişandin.

Çîroka film ji Kurdistanê hatiye girtin ku naveroka wê li ser jiyana karkerên pembo ye.

Ji aliyekî greva wan û problemê xwîniyê û ji aliyê din evînî...

Di film festîwala Antalya ya 12'an de û li derveyî welat, xelatên cewaz wergirtiye.



Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE DE PARIS BIBLIOTHÈQUE

**Îzin-îcaze**

Yilmaz senaryoya film nivîsandiye. Film di sala 1975'an de hatiye kişandin. Li ser çend kesa ye ku ji hepsê bi îcaze derketine ye. Ew kes bi riya keseke din eleqatê bi jinên kerxanê re datînin. Îbrahîm yek ji wan kesan e ku hinekî din bi tora xwe ve girêdayiye.

Di dawiyê de jin û Îbrahîm hinekî hevudin baş nas dikin, lê dereng e, ji ber ku neh salê wî mane. Îbrahîm vedigere hepsê...

**Rojekî mutleqa**

Li ser grubeke şoreşger disekine û problemên wanî malbatî, ji hin awiran ve tîne ziman.

Du kes ji wan, Akîf û Bînalî ye. Pîreka Akîf dev ji wî berdide, ji ber ku êvara dereng tê... Xwîşka Bînalî jî dixine riya xerab. Bînalî dixwaze xwîşka xwe bikuje lê hevalên wî qebûl nakin. Akif jî ji teref grubên faşîst tê kuştin. Cendekê wî di ber çavê pîreka wî re derbas dikin...

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn, film di sala 1975'an de hatiye kişandin.

**Kerî-garan**

Hemo mezinê eşîretekê ye. Lawê wî Şivan bi qîza dijminê xwe Bêrîvan re zewicî ye. Malbat bi xwedikirina sewêl dadikeve. Ji ber pite pita bavê xwe, Şivan dixwaze ji bavê xwe veqete.

Şivan û bavê xwe û birayê Şivan, biryar didin ku hinek heywan bibin Enqerê ji bo ku bifroşin. Şivan pîreka xwe Bêrîvan jî bi xwe re dibe, ji bo ku pêş diqtorekî bike. Piştî diçine bajêr, karê wan nameşe. Jina Şivan li malekî dimre. Şivan tê girtin û birayê şivan xwe winda dike, naxwaze vegere gund. Dawî bav tenê bi serê dimîne, mîna dîna li vî alî û li aliyê din digere.

Film di sala 1978'an de hatiye kişandin. Yilmaz senaryoya film nivîsandiye... Film li Almanya, Hollanda û

îngîlîztan û li gelek deverên din xelatên cure cure girtine. Çîroka film bi xwe, ji nava civata Kurdan hatiye girtin.

**Neyar-Dijmin**

Ismaîl kesek kirêkar e. Rewşa wî ya aborî roj bi roj xirap dibe. Ji ber nakokiyên di nava wî û malbata wî de, tu kes alîkariya wî nake. Piştî demekê pîreka Ismaîl dikeve riyên xirap û ji mal bazdide. Ismaîl biryar dide ku pîreka xwe bibîne û ji holê rake. Lê digere... Lê carekê ji xwe pirs dike: *Gelo ev kuştin dê karîbin pirsên wiha çareser bikin.*

Ismaîl ji nuh ve xwe di çav re derbas dike û jiyana xwe didomîne...

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsandin. Film di sala 1979'an de hatiye kişandin. Film li Berlîn xelata herî mezin wergirt, li welêt jî xelat wergirt.

**Rê**

Filmê rê di warê netewî û navnetewî pir xelat wergirtine, mezinbûna Yilmaz derxistiye holê. Naveroka film li ser hin kesan e ku bi îcazê ji hepsê derdikevin û tên malê ye.

Seyid Alî diçe gund ji bo ku pîreka xwe, ku ketiye riya xirap ji holê rake. Piştî serguzariyeke dirêj tê gund û karê xwe diqedîne.

M. Salih gelekî hez jina xwe dike lê ji ber ku burayê xwe di dema şalandinekê de bi tenê dêhle û tê kuştin, niha li ber çavê xezuranê xwe reş e. Tê malê, lê di dema vegerê de, ji teref xezuranên xwe, di hundirê trênê de tê kuştin.

Mewlut bi dergistiye, lê li gorî adeta nikare zêde tiştna bike. Kela xwe li devereke din dihilîne.

Yusuf di nîvê rê de ji ber ku kaxeza îcazeya xwe hunda dike, tê girtin, izna xwe di girtîgehê de derbas dike.

Ömer vedigere gund, li wir hez ji yekî dike. Lê ji ber karê li ser sînoran birayê wî tê kuştin, di nava nakokiyan de dimîne...

Senaryoya film ji teref Yilmaz hatiye nivîsîn û film di sala 1981'î de hatiye kişandin...

Film li derveyî welat, li Cannes di sala 1982'an de xelata herî mezin girt. Her wiha li Fransa jî xelatek din girt.

**Dîwar**

Li ser jiyana zarokan di hepsên tirkiyê de disekine ku çawa zarok pir alî têne bikaranîn.

Film di sala 1983'an de hatiye kişandin, Yilmaz senaryoya film bi xwe nivîsandiye û birêvebiriya film kiriye. Film pir alî deng da..

Institut kurde de Paris

## Çavkanî:

- 80 filmên Yilmaz Guney
- Siyasal Yazılar I-II, Yılmaz Güney - Mayıs yayınları
- Boynu bükük öldüler, Yılmaz Güney - Dost Yayınları
- Faşizm üzerine, Yılmaz Güney-Ekim birlik yayınları
- Salpa, Yılmaz Güney-Can yayınları
- Sanık, Yılmaz Güney- Can yayınları
- Bir sinema ve anlatıcı olarak Yılmaz Güney, Mehmet Ergün-Doğrultu yayınları
- Halkın sanatçısı-Halkın savaşçısı Yılmaz Güney, H. Yeşil- Dönüşüm yayınları
- Bütün filmleri ile Yılmaz Güney, Agah Özgüç-Afa sinema yayınları
- Mahpus Yılmaz Güney, Hasan Kıyafet - Öteki yayınları
- Yılmaz Güney kitabı, Atilla Dorsay-Varlık yayınları

Institut kurde de Paris

## Pirtûkên Gabar Çiyan ku berî nuha derketine:

- ***Mindalekan/ Kerek û heft gur*** (şanoyên zarokan, bi Kurdî), Zivistana paşîn 1992-Weşanên Rojnameya Yeni Ulke

- ***Tarihte Kürd sürgünleri-1-*** (dîroka ajotina Kurdan, bi Tirkî), Paîza navîn 1992-Weşanên Rojnameya Yeni Ulke

- ***Bexçeya zarokan-1-*** (coxrafya, helbest, çîrok, şano, bi Kurdî), Paîza paşîn 1992-Weşanên Rojnameya Welat

- ***Süryani-Kildani (Aşûrî) 1-*** (ramyarî û edebî, bi Tirkî, Kurdî û Aşûrî), Zivistana paşîn 1993-Weşanxaneya Çand

- ***Süryani-Kildani (Aşûrî)-2-*** (ramyarî û çandî, bi Tirkî, Kurdî û Aşûrî), Newroz 1993- Weşanxaneya Nsibin

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Em bi awayek vekirî dibêjin û dengê xwe bilind dikin: **ji bo parastina heqê Kurdan, ji awira avakirina dewletekê serbixwe, heqê demokratîk û neteweyî, emê têkoşînê bidin û şer bikin.**

**Emê stiran û destanên xweyî serkevtinê di nava şer de biafirînîn. Bila hemu kes zanîbe ku; serkevtin para me ye, para çîna kirêkar, gelên bindest û netewên hejar e.**

***Yilmaz Guney, "Nivîsên ramyarî III.***

Institut kurde de Paris

ISBN 91-630-1637-7

K.I. A